

BERBANG

Organa Federasyona Komelen Kurdistanê Li Swede ★ Sal:6 Hejmar 5/87 (43)

Îsmâîl Beşîkçî

” *Li Tirkiyê,
ji hepsê derketin
nayê wê manê
ku mirov
dighêje azadiyê.* ”

www.kurdistan.org

BERBANG

Organa Federasyona Komelên Kurdistanê
Li Swêdê
Organ för Kurdiska Riksförbundet

Berpirsiyar

K. Îzol

Serekredaktor

R. Zilan

Redaksiyon

M. Bekir, C. Hayderî, J. Kurdo, R. Simo

Karê teknîkî

Broyê Macîr, Bavê Rojbîn

Ansvarigutgivare

K. Îzol

Chefredaktör

R. Zilan

Redaktion

M. Bekir, C. Hayderî, J. Kurdo, R. Simo

Sättning och layout

Broyê Macîr, Bavê Rojbîn

Adress

Box 45205
S-104 30 Stockholm

Telefon

08/68 60 60

Postgiro

64 38 80-8

Aboneti/Prenumeration

Kes/Enskilda: 100 Skr./sal-år
Meqam/Myndigheter: 200 Skr./sal-år

Îlan/Annons

Rûpela paşîn/Baksida: 2000 Skr.
Rûpelên navîn/Insidor: 1000 Skr.

Redaksiyon ne berpirsiyarê nivîsarên bi îmze û axaftinên Federasyonê ye. Nivîsarên ku ji Berbangê re tên şandin, heke çap jî nebin, li xwedî nayên vegeandin.

ISSN-0281-5699

Xwendevanên hêja,

Redaksiyona Berbangê, piştî Dr. Îsmail Beşîkçî ji girtîgehê hat berdan, bîryar girt ku li ser dîtî û jiyana wî hejmareke xas hazir bike. Ev hejmara Berbangê bi temamî bi vî awayê hatiye hazir kirin.

Dî vî warî de me ji hin kesên ku Dr. Beşîkçî ji nêzîk ve nasdikirin, pê re li hepsê mabûn, têkîlî danî ku li ser Îsmail Beşîkçî yek nivîsan binivîsin. Piraniya wan kesan di dema 12-yê adara 1971-an de bi Beşîkçî re di girtîgeha Diyarbekirê de mabûn. Jiyan û dîtînen wî baş dizanîn. Çend hevalan li ser xwestina me nivîsên xwe yê li ser Dr. Beşîkçî ji bo me şandin. Gelek spas ji bo wan.

Berbang bi vî xebatê dixwaze du vatiniyên girîng bîne cîh. Yek ji wan, qiymetdaneke mezin ji bo xebatên Dr. Îsmail Beşîkçî ku bi hemû aliyan ve hêjayê pesnên giranbiha ye. Ji aliyê din ve jî bi awakî tevayî û pêşkêşkirina xebatên Dr. Beşîkçî ji bo xwendevanên Kurd re. Herçend li ser Dr. Beşîkçî di van salên dawiyê de gelek tişt hatin nivîsin jî, piranî bi zimanê tirkî bûn.

Dr. Beşîkçî wek mirovekî ronakbîr, zana ji bo parastina doza gelê kurd bi xurtî têkoşînek bêhempa da, rîskên mezin girt ber çavan, ji karê xwe hat avêtin, 11 sal di girtîgehan de ma. Lê, ji ber ku ew bi rastiya dîtînen xwe bawer bû, hovîtiya kolonyalîstan yan jî newêrekîya "ronakbîr û demokratên" din yê tirkî, ew tu car jî dîtî û xebatên wî ya li ser kurdan dâr nexist.

Her ku teda û înkarkirin li ser şexsê wî û li ser gelê kurd zêde dibû, dengê wî hîn bilintir dibû. Rastiyên ku wî diparast, ji bo wî vatiniyek mirovî û hêja, lê ji bo kolonyalîstan û "ronakbîrên" sexte jî rûreşiyek mezin bû. Ne dewleta Tirkiyê, ne jî "ronakbîrên" sexte yê tirkî ji bin vî rûreşiyê xwe zû bi zû nikarin xilas bibin. Ev wek damgayek reş li ser eniyên wan de disekine.

Cesaret û berxwedana Dr. Îsmail Beşîkçî divê ji bo hemû kesên ku xwe demokrat û mirovperwer dizane, ji bo hemû Kurdên ku ji bo jiyaneke azad û serbest dixebite, bibe numuneyekî girîng.

Dîtî û xebatên Dr. Beşîkçî wê ji bo me kurdan hergav wek piştgiriyeke hêja, bi mîrxasî parastina zanistê û prensîpên mirovî, bimîne.

Keya Îzol

Berga pêşîn: Dr. Îsmail Beşîkçî

Foto: Kurdistan Press

Sal: 6 Hejmar 5/87 (43) 30.9.1987

Mirovê Mirov

Îsmail Beşikçi

Di dîroka mirovaniyê de gelek zane hene ku serê xwe dane, lê ji prensîpên zanistiyê kompromîs (tawîz) nedane. Yek ji wan zanayên ku ji prensîpên zanistiyê kompromîs nedane, zanayê mîrxas Îsmail Beşikçi ye.

Ji roja ku komara Tirkîyê hatiye damezrandin û bi vir de, dewleta tirk hebûna netewê kurd înkâr dike. Herçend hemû cîhan pê aghdar e, ku neteweke kurd; xwedî ziman, dîrok, erd û çandê dewlemend heye jî, îdeolojiya dewleta tirk ya resmî, kemalîzm, vê rastiyê tucar qebûl nake. Ji bo ku netewê kurd ji holê rake, dewleta tirk hemû hêzê xwe bi awayên ku mirovaniyê mahkum kiriye, bi kar tîne.

Neteweyê kurd li hember vê dînreşiya dewleta tirk hertim serî hildaye û hebûna xwe bi gernasî parastîye. Ew heye û wê her hebe. Lê li hember dînreşiya dewleta tirk, zanayên vî welatê hertim bédeng mane, tucar li dijî îdeolojiya kemalîzmê, ku rastiyê înkâr dike, derneketine. Bi ser de jî gelek ji wan "zanan" di refên kemalîstan de cîh girtine.

Îsmail Beşikçi, ku bi xwe tirk e, di vî warî de îstîsnayek e. Ew li hember îdeolojiya kevneperest û dijminê mirovaniyê bédeng nemaye. Ewî di lêkolînên xwe yên zanistî de bi xurtî şerê kemalîzmê kir û îspat kir ku kemalîzm îdeolojiyeke kolonyalîst û nijadperest e. Herweha ewî bi pîvanên zanistiyê da zanîn ku neteweyê kurd heye û xwedî ziman, dîrok, erd û çandê dewlemend e. Divê ew netewe li ser mafê xwe yê çarenûsî bi xwe bîryar bide.

Bi vê yekê Îsmail Beşikçi pêdiviya zanebûnê bi cîh anî. Ewî nîşan da ku Ew bi rastî zane ye; li cem rastiyê û li dij neheqiyê cîh digire. Bêgoman dewleta tirk li hember Beşikçi bédeng nema. Gava tirs û tehdît, ji karavêtin tesîrî Beşikçi nekir, vê gavê zindan û lêdanê destpêkir.

Beşikçi ji ya xwe nema. Ewî di zîndanê de jî, di bin lêdanê de jî rastî got; neteweyê kurd heye û ji mafên xwe yên netewî bêpar e, welatê wî Kurdistan jî kolonî ye. Tenê ji bo parastina vê rastiyê Beşikçi ji deh salî bêtir di zindanê de ma. Belê, Tirkîyê welatêkî weha ye. Ji bo ku zaneyek rastiyê diparêze, vatiniyê xwe bi cîh tîne, deh sal ji emrê xwe di zîndanê de derbas dike.

Bi vî tevgera xwe Beşikçi nîşanî hemû cîhanê da ku ew xebatkarekî zanistî ye û li hember zanistê vatiniyê xwe bi cîh tîne.

Li vir divê em pirsîyarekî bikin. Gelo ew kesên ku li Tirkîyê xwe wek "zana" dibînin, li hember Beşikçi vatiniyên xwe bi cîh anîn an na? Bersîva vê pirsê bêgoman "na" ye. Divabû ku ew kesên ku li ser navê zanistê diaxivin, bi kêmanî rastiyên ku Beşikçi gotiye, biparastana û herweha li dijî ew zor û zilma ku li Beşikçi hate kirin, derketana. Lê wan bédengî tercîh kirin û bi vî awayê jî di refên kemalîstan de cîh girtin.

Divê bête diyar kirin ku li hember Beşikçi kemasiyên nunerên netewê kurd jî hene. Berî her tiştî heta niha tu xebateke Beşikçi tercumeyî kurdî nebûye. Herweha kêma xebatên wî ji alî kurdan de tercumeyî zimanên cîhanê bûne. Ji bo rizgarkirina Beşikçi jî divabû ku kurdan bi giştî bi hev re xebat bikin.

Bêgoman kevîrê Beşikçi li cem gelê kurd giran e. Ez bawerim, roja ku Kurdistan azadbe, navê Beşikçi dê li gelek dibistan û zanîngehên kurdî bê danîn.

Du parlamentên Awistralya, Beşikçi jî bo xelata Nobel ya aşitiyê pêşkêş kirin. Bi dîtina me ew pêşniyareke hêja ye û di cîh de ye. Mirovê mirov, Îsmail Beşikçi bi tevgera xwe nîşan daye ku ew layiqê xelata Nobel e.

Hanefî Celeplî

Serbilindiya berxwedan û serketinê:

Rojen Barnas

Sosyolog Dr. Îsmail Beşikçi, di 25 ê Gulanê de ji bendixana Entabê ya Arizî, bi kişandin û temamkirina cezayê xwe derket. Kovara pêşverû û demorat a Tirkîyê, "Yenî Gündem", bergê xwe yê pêşîn bi wêne û nûçeya ji bendixanê derketina vî alimê mîrxas xemiland, giraniya tema vê jimareya 64-a, da nûçe û reportajên li ser doza wî.

Ji wê jimareyê bi vê de ev bûn pênc jimare ku derdikevin, tu jimarekî tune ku di rûpela "okur forumu" (Meydana xwendevan) de selav li Beşikçi neyên kirin û ji ber şêla demokratî ku cara pêşîn e kovareke Tirk a li Tirkîyê bi vî awayî bi piştgirî cî daye Beşikçi, kovar bi xwe neyên pîroz û teqdîr kirin.

Bi rastî jî şêla "Yenî Gündem"ê bi awake demokratîk nêzikayî bi pîrsa Kurd û di nav entellektuelên Tirk de bi temsîlkarê wê Dr. Beşikçi dayin, bi her awayî layiqê teqdîr kirinê ye.

Bendîtiya Beşikçi paşîn ji ber namekê bû. Hê di bendixanê de ji sereka Yekîtiya Nivîskarên Swîsê, Stî Boulanger re vê nameyê dinivîsîne, ji ber ku ev name digel hin xerûperên wî yên dîtir ji aliyê karbidestên bendixanê tene derdestkirin, êdî nikare bişîne. Ev nameya neşandî bi vî awayî dest pê dîke:

"Îdeolojiya resmî; dîtina xwe ya, li Tirkîyê tunebûna neteweyekî ku bi navê Kurd tê nasîn, zîmanekî ku bi navê Kurdî tê zanîn bi îsrar û bi înad dimeşîne. Vê îdeolojiya ku bi kurtî em dikarin bi navê kemalîzmê binav bikin, xisûsiyeteke wê ya bîngêhîn; bi awaka mutlaq antî-Kurd bûyin e! Nîjadperest e û kolonyalist e. Û ev îdeolojiya resmî bi Unîwersîteya Tirk, bi mehkemeyên Tirk, bi partiyên siyasî yên Tirk, bi navgînên aghadarî yên gelemperî; weşan, radyo û televîzyon dane qebûl kirinê. Di vê pîvajoyê de navgînên bi her awayî yên

îdeolojîk ên dewletî û navgînên zordana cebrî hatine bikaranînê û tene bikaranîn." (Yenî Gündem, jimar 64, rûpel 10)

Ji ber vî nameya arizî ya neşandî û li tu derê neweşandî, 10 sal cezayê bendîtiya giran danê ku bikişandina vî cezayî di 25'ê Gulanê de ji bendixanê derket.

Ji Hezîrana 1971 heta 25-ê Gulana 1987, di şanzdeh salan de deh sal û deh mehên wî di riya baweriya wî ya ilmî, di riya têkoşîna hebûna neteweyê Kurd li Tirkîyê, hebûna Kurdistanê li Tirkyê, hebûna mafê neteweyê Kurd yê serxwebûn û azadî di bendixanan de derbas bûn.

Di tarîxa dewletên Kurdistanê parvekir de ev cara pêşîn e, ku alimekî ji neteweyê serdest, li dijî îdeolojiya resmî ya dewleta xwe, ji bona hebûna neteweyê Kurd, welatê wan î Kurdistanê bi raya gelemperî bide qebûl kirinê, ew çend têbikoşe û di vê riyê de ewçend ceza bixwe.

Li dewletên Kurdistanê parvekir de, li unîwersîteyan alimên, di piyasa kulturî de nivîskar û şairên navdar ên, di hukumetan de wezîrên, di meclîsên neteweyî de nimînendeyên, di partiyên siyasî de pêşkêşên bi eslê xwe Kurd jî hebûne û hene: Lê belê tucar mîna Beşikçi xwe jê berpirsiyar dîtina ji têkoşîna di riya namûskariya rastiya hebûna neteweyê Kurd, ji xwe re nekîrine bar û piştî û serêşana bereday(!). Li bilûra îdeolojiya resmî xistin û pê neteweyê Kurd mîna pez xewirandin ji bo wan her tim hêsatir biye.

Di riya îsbata hebûna neteweyê Kurd, welatê wan î Kurdistanê û tarîxa wan a serxwerabûnan de, Beşikçi bi tenê li dijî îdeolojiya resmî tenekoşîye, li hember rewşenbîr û pêşkêşên siyasî yên Kurdan jî têkoşîneke bêçavniqandin meşandiye. Ji van rewşenbîr û pêşkêşên siyasî yên Kur-

dan hin jê heta van sê-çar salên dawîn, hin jê jî hê jî neteweyê Kurd ne wek netewekî, lê wekî grûbeke etnîk an wekî gelekî (xelk) ku tabîê Cumhûriyeta Tirkîyê û di nav tixûbên "mîsak-î millî" (Sonda millî ya Mustafa Kemal) dîtine an dibînin. Serxerabûna neteweyî û demokratîk a bi navên Şêx Seîd û Dêrsimê, li hember Cumhûriyeta Kemalîst a îngîlabperwer(!) dijrabûneke feodal û kevnepêrest dêrine an didêrin.

Di xisûsa van rewşenbîr û siyasîyên legal de, Dr. Beşikçi vê teşxîsa hanê danî:

"Neteweyê Kurd organîzmakê zindî ye, ku bedena wî, welatî wî î Kurdistan e. Rewşenbîrên netewekî mêjiyê wî ne. Kurdistan ji dervayê îrada neteweyê Kurd hatiye perçekirin, biye çar perçe. Yanî herdû ling û herdû milên wê birîne, jêkîrine. Gava bedena organîzmakê perçekirî be, ewê êşa vê perçebûnê janê bide mêjî, mêjî jî dê nikaribe fonksiyonên xwe bi tendurustî bi cî bîne. Rewşa ku rewşenbîrên Kurd îro tê de ne, ev e."

Dr. Beşikçi di 1971, di bendixana leşkerî ya Diyarbekirê de xwest ku rewşenbîrên Kurd xwedî li Serxerabûna Şêx Seîd a neteweyî-demokratîk derkevin. Beravaniya xwe ya siyasî li ser hebûn û daxwaziya mafên demokratîk û mirovî yên neteweyê Kurd ava bikin, ne ku bi defil anînen ji Nutqa Mustafa Kemal ji axaftin û xebatên xwe yên der xisûsa neteweyê Kurd re li fetwayan bigerin. Di vê xisûsê de Beşikçi gelek têkoşî lê bi serneket. Bi vê têkoşînê û bi rexneyên xwe yên li hember beravanînameya TIP'ê (Partiya Karkerên Tirkîyê) ya ku şandî bûn "Anayasa Mahkemesi" Beşikçi dilê gelek kesan ji xwe hişt, lê di dilê gelek welatparêzan de jî mezin bû.

Bi cî bûna dimokrasîyeke tekûz li

Dr. Îsmaîl Beşîkçî

Tirkîyê, bêî qebûlkirina hebûna neteweyê Kurd û naskirin û teslîmkirina mafên wî yên neteweyî-dimokratîk-mirovî, ne gengaz e. Di vê riyê de têkoşîna demokratîk î entellektuelî, bêî rexnekirin û dişîfrasyona Kemalîzmê û kirên dîktatoriya dema yek partî ku bi qanûnên gelek hişk hatine parastinê, dîsa ne gengaz e. Rexnekirin û dişîfrasyona Kemalîzmê bi tenê ne benda li ber bişkaftina pirs-girêka neteweyê Kurd e, lê her wisa benda li ber pêşveçûna fikrên demokratîk û pêşveçûnên tevgerên civakî ne jî. Dr. Beşîkçî vê niqetya girîng berî şanzedeh-hivdeh salan fesilandiye û di dişîfrasyona wî de têkoşîneke bêrawestan daye. Şerefa bi awakî aşkere destpêka vî karî jî bêguman a Beşîkçî ye.

Dr. Beşîkçî di riya bawerîya xwe de bê çiv û fetl, bi serbilindî diberxwe-da. Îro jî di hêşîya bi serketinê de ye. Li Tirkîyê êdî pirs a Kurd a tabû di nav derûdorên demokrat de ji tabûtiyê derketiye, kovarên demokrat bi bizav li serê dinivîsin. Yekî mîna Ecevît ku tobekeke îfadekirina gotina "Kurd" bû, êdî dibizive û gotinê telafûz bike, ku me di xewna xwe de jî bidîta me yê bawer nekira.

Ji ber kirên xwe Dr. Beşîkçî ji aliyê siyasatgêr û alimên du welatên cihê yên Ewropayê navdayiyê ji bo perûya aşîtiyê ya Nobelê hatiye pêşneyar kirin. Ev li Tirkîyê wek şoqekê tesîr kir. Ewê û perûyê bidîne an nedinê, li ba dilê min ew çend ne girîng e. Ji aliyê îmkânên madî, ji aliyê tesîra psîkolojîk û bilindkirina moralê mirovên demokrat helbet girîng e. Lê ew perûya ku dan Menahem Begîn dikarin îsal bidin Xumeynî û Saddam jî.

Perûya herî mezin ji bo Beşîkçî Kurdîstaneke yekbûyî, serbixwe, demokrat û aza ye. Ji bo hina ev îro xweneke şairane ye. Belê çûna hîvê, ya marîxê berî çend dehsal xweneke şairane ya çiroknivîsên zarokan bû, lê îro mirov çûnê, hatin, diçinê û tîn.



Dr. Îsmâîl Beşîkçî

Sembola rûmeta zanistê

R. Zîlan

Îsmâîl Beşîkçî, piştî ku demeke dûr û dirêj ji azadiya xwe hat bêpar kirin, di 25-ê Gulanê de ji hepsê derket. Ew li Tirkîyê yekemîn kes bû, ku li gor madeya 140-î ya Qanûna Cezayî ya Tirkîyê hatibû ceze kirin. Ji ber nameya ku wî di 14-ê Tebaxa 1980-î de ji sereka Yekitiya Nivîsevanên Swîsrê Stî Bonlanqerê re nivîsibû, karbidestên Tirkîyê 10 sal ceza giran dabûnê. Ev name, nameyê spasdariyê bû, ku Beşîkçî ji Yekitiya Nivîsevanên Swîsrê re şandibû. Yekitiya Nivîsevanên Swîsrê, gava ku karbidestên Tirkîyê di 6-ê Îlona 1979-an de 3 sal ceza dabûn Beşîkçî, li Beşîkçî û doza wî xwedî derketibû. Lê pirsîbû, bi wî re eleqedar bûbû û karbidestên dijminên zanistî û pêşrevên kemalîzmê protesto kiribû.

Beşîkçî weha dest bi wê nameya xwe kiribû: "Îdeolojiya resmî ya li Tirkîyê bi îsrar û rikdarî hebûna neteweke bi navê Kurd û zimanekî bi navê kurdî înkâr dike. Ev îdeolojiya han ya ku em bi kurtebirî jê re dikarin bibêjin kemalîzm, bi awakî misoger li dijî Kurd e. Nijadperest û kolonyalîst e. Ev îdeolojî bi zanistgehên Tirkan, bi organên dadmendî yên tirkan, bi partiyên siyasî, bi navgînên ragihandinî yên wek çapemenî, radyo û Televîzyona Tirkan jî dane qebûl kirin. Di vê maweyê de her cure navgînên zordestiya îdeolojîk û navgînên zorlêdanê bi kar anîne û bi kar dihînin. . " Herçendî ev name, nameke şexsî û taybetî bû û li çu cîhekî jî nehatibû belav kirin, dîsan jî besî dayîna cezeke 10 saliya giran dikir. Her weha ev name dibû hoy û seba ku di dîroka Tirkîyê de cara pêşîn madeya 140-î ya Qanûna Cezayî ya Tirkîyê bihête şuxulandin. Madeya 140-î ya ku cara dawîn di 20.9.1946 an hatiye guhartin û di Hezîrana 1981-an de jî Beşîkçî jê re yekemîn gorî û qurbanî hatiye hebijartin, weha dibêje: "Hemwela-



Foto: Kurdistan Press

tiyê ku li welatekî dereke ji bo şikandina rûmet yan jî nifûsa dewletê ya li derveyî welêt di derheqa rewşa hundir ya dewletê de bûyer yan jî nûçeyên bêî bingeş, bi mubalaxe yan jî yên ji bo armançê taybetî belav dike, yan jî yên ku bi rabûn û rûniştina xwe ve zîyanê dide berjewendiyê neteweyî, divê ne kêmî pênc (5) salan bihête ceze kirin (ceza giran)."

Heçî ev ceza 10 salî bû, ne ceza

pêşîn û ne jî ya dawîn bû. Îsmâîl Beşîkçî ku niha 48 salî ye, heya niha 30 sal ceze xwariye, Wî, di van 16 salên dawîn de, 10 sal û 10 meh di zîndanên cihê cihê yên dewleta kolonyalîst de derbas kirine. Bi vî awayî piraniya salên wî yên herî bêrdar û meywedar bi qestî di zîndanên de hatine rizandin. Lê di gel evçend hovîti, zorkerî û zêrandinê jî, wî dev ji duristiyê xwe ya li hember zanistê berneda.

Xwe wek gelek kesên din yên bi tîtel û kariyerên derewîn nekir hestîkoj û îdeologê kemalîzmê. Ji bo çend qurûş û hin destkewtên civakî jî rûmeta xwe neavêt bin lingên bêrûmet û xwefiroşan.

Gotinên jorîn jî bi me qenc didin nîşandan, ku di zindanan de rizandîna 11 salan jî ew teslîm nekiriye. Beşikçi wan her li ber deriyê girtîxana Entabê dibêje û bi karbidestên faşîst û kolonyalistên Enqerê careke din dide zanîn, ku înkara rastiyê jî bo çareserkirina pîrsgirêkên Tirkiyê nabe çu rê. Ew bi van gotin û şirovekirinên xwe ve rewşa rastîn ya ku Tirkiyê îro tê de ye, dihîne zimên. Ew jî, berî her tiştî tunebûna mafê azad û serbest hizirîn, gotin, nivîsîn, livîn û xwetevdanî ye. Ango tunebûna mafên azadiyên bingehîn yên mirovan e. "Azadiyên" heyî bi tenê ji bo gotina nerastiyê û xapandina awira giştî ya cihanê ne. Qeyd û bendên ku cunta faşîst ya generalên ser bi Amerikayê danîne ser hêmanên azadiyê, bûna kost û astengên sext û giran li ser rîya demokrasiyê rast û durist.

Beşikçi kî ye?

Dr. İsmail Beşikçi di sala 1939-an de li bajaroka İsklîpê ku bi bajarê Çorûmê ve girêdayî ye, ji dayîk bûye. Piştî bi dereceke baş dawîanîna xwendina lîseyê, ket fakulta zanyariyên

siyasî ya zanistgeha Enqerê. Ew, cara pêşîn gava ku ji bo staja xwe di havîna sala 1960-î de diçe Xarpêtê, li wê rastî Kurdan û civata Kurdî dihêt.

Heçî salên 60-î bûn, ji aliyê qewmandinên siyasî de salê tijî bi bûyer bûn. Li Tirkiyê leşkeran dest danibûn ser hukum, 49 ronakbîrên Kurdan hatibûn zindan kirin. Bi dû re 23 ronakbîrên din jî hatibûn girtin. Pirtûk, rojname û kovarên çep çerçeweyên qedexeyê siyasî yek bi yek dişikandin. Bîr û baweriyên çepîtiyê hêdî hêdî dikete Kurdistanê jî. Lê li Tirkiyê jî li ser welatên paşdemayî, "Pîrsên herêma rojhelat" û hwd. gelekî dihatin axaftin, nivîsîn. . .

Beşikçi jî di rewş û nîrekî weha de xwendina xwe ya bilind di sala 1962-an de kuta kir. Her di dawiya vê salê de ew li Bedlisê bû esker. Di maweya eskeriya xwe de, Kurd û civata Kurdan bêtir û jî nêzik ve naskir. Bi dû eskeriya xwe re azmûna asîstaniyê ya di zanistgeha Erzurumê de qezenc kir û li wir dest bi karê zanistiyê kir. Di sala 1967-an de têza xwe ya li ser "Eşîreta Elikan ya Koçer" da û bû doktorê sosyolojiyê. Ji vê salê û bi şûn de Beşikçi birûskên kolonyalistan kişande ser xwe. Nemaze piştî derketina "Analîza xwepêşandanên Rohilat" û "Rîsta Rojhilata Anadolîyê" ew ket ber diranên çerxa bêbavan. "Zanyarên" hestîkoj yek bi yek ew gilî kirin û jê re bîr vedan. Di

dawiyê de karê wî ji dest standin. Lê Beşikçi di sala 1971-an de azmûna asîstaniyê ya di fakulta zanyariyên siyasî li Enqerê qezenc kir û vê carê li wir dest bi kar kir.

Ew di 24.6.1971 an de ji aliyê dadgeha leşkerî ya bajarên Diyarbekir û Sêrtê de hat girtin. "Zanyarên" hestîkoj îxbarî li ser îxbarî lê barandin. Dem û dezgehên faşîst û kolonyalistan 13 sal û 7 roj ceze danê. Lê ewî di tîrmeha 1974-an de ji efûyê îstifade kir û ew ji hepsê derket. Gava ku xwast vegere ser karê xwe yê berê, rê nedanî. Wî jî li derveyî zanistgehê karê xwe yê lêkolîn û lêhûrnêrînan zanistî domandin. Jîna li derveyî girtixanê ya Beşikçi zêde ne domandî. Di 6.9.1979 an de ji ber afirandina xwe ya bi navê "Metoda zanistê Bikaranîna wê li Tirkiyê II, Têza Dîrokê ya Tirkan û pîrsa Kurdî" 3 sal ceza danê. Di mehaya nîsana 1981-an de ceza xwe kuta kir û derket. Lê bi dû re di mehaya Hizêranê de dîsan hat girtin. Vê carê jî ji ber nameyekî. . . Ji wê rojê heya 25-ê Gulana 1987-an di zîndanên faşîstan de girtî ma.

Çu tişteki piştî Beşikçi neda erdê. Dê nikaribe bide erdê jî. Wî rûmeta zanistê neda bin lingên îdeolobgên resmî, kemalîst û karbidestên dijminên rastiyê û zanistê. Heya ku zanist bimîne, dê navê kesên birûmet yên wek Dr. İSMAIL BEŞİKÇİ jî di bîra mirovahiyê de bimîne.

Çend afirandinên Beşikçi

Rîsta Rojhilata Anadolîyê
Bingehên civakî-aborî û etnîkî
Çapa Yekemîn, Weşanxana E, Tîrmeh 1969, 302 rûpel Engere,

Ev çapa pêşîn ya lêgerîna zanistî ya li ser civata Kurdistanê Bakur e. Beşikçi di vê afirandina xwe de, wek zanyarekî sosyolog, di dîroka Tirkiyê de yekimîn kes e, ku pîrsa Kurdistanê bi ser û berî lê dikole. Hoy û sebebên pîrsê bi bingehên wan yên civakî, aborî û etnîkî ve berpêş dike. Ew dide zanîn ku çareserkirina pîrsa Kurdistanê, bê nasîna bingehên civakî, aborî û etnîkî, ne mumkun e. Hukûmetên hatî-çûyî di tedbîrên xwe yên çareserkirina vê pîrsê de bi daxwazêke din lê nihêrîne. Giştî plan û projeyên wan ji bo armanca asîmîle-

kirina xelqê vî welatî hatine li dar xistin. Heçî plan û projeyên aborî bûn, li ser hûmên şêlandina dewlemendiyên ser erd û bin erd yên wî hatine birêxistin. Herweha "nedîtina" bingehên etnîkî hoy û seba serekî ya çaresernebûna pîrsê pêk dihanî.

Rîsta Rojhilata Anadolîyê
Bingehên civakî-aborî û etnîkî
Çapa Duhemîn, Weşanxana E, Çileyê pêşîn 1970, 519 rûpel, Enqere

Ev pirtûk çapa didwan ya afirandina wî ya Rîsta Rojhilata Anadolîyê ye ku di sala 1969-an de derketîbû. Lê ev çap bêtir bi ser û ber e, gelek aliyên pîrsê bêtir bi hûr û kûrahî hatine lêkolîn.



Pirsa Kurd û Kurdistanê û Dr. ÎSMAÎL BEŞÎKÇÎ

Selîm Keya

Di Komara cumhurî ya Tirkîyê de, tunebûna gelê Kurd û Kurdistanê bin-gehek bû. Lê belê, ji wê demê şûnve jî her dem pirs Kurdistanê û gelê Kurd, ji bo dewleta Tirk bû derd û kuleke esasî. Dewleta Tirk ji bo ku gelê Kurd bihelîne, karûbarên qirêj, neînsanî, nijadperest û kolonyalist kirin. Gelê Kurd jî, li hemberî van politîkan her dem serî hilda. Piştî serîhildanê hat qetil kirin û welatê wî hate wêran kirin. Van qetlîam û kuştinan jî nikarî gelê Kurd ji holê rake an jî bihelîne; Kurdistanê ji xerita cîhanê û Rojhilata Navîn rake. Di rastiya dîrokê de, gelê Kurd zêde bû, roj bi roj-za, pêşket. Gelê me, di bin sedemên ne tabî û tarîtiyê de jîyana xwe domand. Bizava rizgarîxwaz û azadîxwaz ya gelê me, di bin zordestiyê de geş bû, gihîşte merhaleke rêxistinî.

Di 12-ê adarê û 12-ê îlonê de jî, politîka dewleta Tirk nehate guhêrandin. Ji alîki ve hat gotin, ku "gelê Kurd tune ye". Ji alîki ve jî, ji problêma "perçekirina Tirkîyê" hat bahs kirin. "Perçekirina Tirkîye" bû sedema girtin û kuştina xortan, ronakbîran, karker û gundiyan. Ji girtin û kuştinê zêdetir şoreşger welatparêz û sosyalîstan zarar dîtin. Ji demê buhurî ferqîr, gelek şoreşger û sosyalîstên Tirk û hêzên welatê serdest, di bin tohmata pirs Kurdistanê de man; hatin girtin û kuştin. Di dadgehê "hesab dan" û pirs Kurdistanê parastin. Dostanî û hevaltiya gelê Kurd kirin.

Li 12-ê adarê, di dîroka Kurdistanê de sê unsurên esasî hatin pêş. Ev unsurên esasî, Partiya Karkarên Tirkîyê (TIP), DDKO û Partiya Demokrat ya Kurdistanê - Tirkîyê (PDK-T) bûn. Li cem van sê unsurên esasî, unsureke



Foto: Kurdistan Press

bingehîn ya din jî hebû. Ew jî, ronakbîr, demokrat û akademîsyên Dr. Îsmaîl Beşikçi bû. Di wê demê de Î. Beşikçi kete bin barekî giran. Beşikçi, ew barê xwe bi mêranî, dilsozî, kêfxweşî û bi ken rakir. Bi eniyêke vekirî, bi serbilindî meşiya. Doza gelê Kurd û Kurdistanê vekirî parast. Di dawiya vê parastin û mêraniya xwe de, cezake giran xwar. Ne bes di dadgehê de, di zîndanê de jî bi mêranî û bi serbilindî erk û wezîfên xwe anîn cîh. Hewl da ku, Kurdî fêr bibe. Di fêrbûna Kurdî de li gor mercên wê demê gavên gelekî pêş jî avêtin. Bû heval û dostê belengaz û welatparêzên Kurdistanê. Li dijî teslîmiyeta ronakbîrên Kurd yê reformîst, bi

xurtî û bi prensîbên hişk (ortodoksî) sekinî.

Dr. Beşikçi, ji bo ku Tirk bû, di dilê kolonyalîstan de birîneke kûr vekir. Tevî vî tiştê bingehîn wî tesîr li ser dil û zanyariya xebatkar û ronakbîrên Tirk jî kir. Lê belê li wê demê tu ronakbîr û şoreşgerên Tirk, li Beşikçi xwedî derneketin. Ew nemaza ji aliyê ronakbîrên Kemalîst ve hat suçdar kirin.

Piştî sala 1974-an jî, ji aliyê Beşikçi ve, di dîroka Kurdistanê de tablo nehat guhartin. Piştî van salan, Beşikçi, bi xurtî û bi baweriyeke bêhempa, doza gelê Kurd û Kurdistanê parast. Ji bo ku doza gelê Kurd û Kurdistanê ji aliyê sosyo-polîtîk û

sosyo-aborî zelal bibe, lêkolîn kir. Di warê pirsên bingehîn de, pirtûk nivîsîn û çap kirin, bêtirs û vekirî belav kirin. Li hemberî dewleta kolonyalist ya Tirk, wek têkoşerekî kar kir. Di dawiya van lêkolîn û têkoşîna xwe de, berî 12-ê îlonê hat zîndan kirin. Piştî ku li 12-ê îlonê cunta faşîst û kolonyalist hate ser hukim, barê wî giran bû. Ji ber ku Beşikçi Tirk bû, nehati-bû îslah kirin, zêdetir tade û zilm dît, cezake giran xwar.

Di vê demê de em li meselê binêrin: 1- Beşikçi, di zîndan û dadgehan de, wek têkoşerekî Kurd hereket kiriye. 2- Erk û wezîfên xwe wek ronakbîrekî şoreşger û demokrat aniye cih. 3- Doza gelê Kurd û Kurdistanê bi zanistî û bi mêranî li herderê, di bin mercên gelek dijwar de parastîye. 4- Bi parastin û têkoşîna xwe ve, bala cihanê kişandîye. 5- Di dilê gelê Kurd, welatparêz û şoreşgerên Kurdistanê de cîhekî bilind girtiye, 6- Di xebat û têkoşîna xwe de, uslubeke taybetî pêk aniye. 7- Li Kurdistanê di nav hareketa rizgarîxwaz û azadîxwaz de, di danîna xeta îdeolojîk û siyasî de bû xwediyê tesîrekê.

Wek tê zanîn, piştî 12-ê îlonê, jiyan wî ya zîndanê dirêj bû. Ji sala 1970-î û bi virde, ji emrê xwe 11 sal di zîndanê de derbas kir. Roja ku ji zîndanê derket, rojnamevanan jê pirsîn "Tu azad bûyî. Ti çi difikirî?" Bersîva wî, "Ji zîndanê derketina min, azadbûne. Heta ku li Tirkîyê tade û zilm berdewam bibe, mirov nikare ji azadiyê behs bike." Ev gotin û nêrînên Beşikçi, dûrdîtin û mesûliyeta wî ya îlmî û şoreşgerî nîşan didin. Di eynî demê de armançên wî yê rojên pêş jî didin xuya kirin. Û vekirî jî got ku, "Ez ê xebata xwe dom bikim. Destpêkê, ez dixwazim li ser pirsê Tirkên Bulgaristanê bisekinim. Bi taybetî jî, ez dixwazim li politîka Tirkan û ronakbîrên Tirkan, ku di vê pirsê de meşandine, bikolim, rexne lê bigirim û "Cotstandartiya" wan bidim xuya kirin." Serkeftin û serfiraziya Beşikçi daxwaza me ya mezin e.

Demek dûr-dirêj, ronakbîrên Tirkîyê, ji Beşikçi re xwedî derneketin. Sedemên vî rewşê gelek in. Lê dema ku em sedemên bingehîn bidin xuya kirin, tablo weha ye. 1- Tirsê rejîma zordest û kolonyalîstan hebû. 2- Tesî-

ra şovenîzmê ku li ser ronakbîran kospeke mezin pêk anî. 3- Nezertengî bû. 4- Nebûna wasîtayên şoreşger û demokrat. Wek kovar û rojnamên demokrat û sosyalîst hatin qedexe kirin. Berpirsiyarên wan hatin zîndan kirin, kuştin û cezakirin.

Ne bes ronakbîrên Tirk, lê şoreşger û demokratên Kurdistanê, hêz û partiyên welatparêz jî, li gor layiqiya xwe, ji Beşikçi re xwedî derneketin. Sedema wê ya bingehîn bîr û baweriyên politîk û îdeolojîkî, tercîha wî ya rêxistinî bû. Bawer dikim, her mirovê hiş li serî û bi mesûliyet, ev xeletiya xwe tespît kiriye. Vekirî nebe jî, di hundurê xwe de û di platformên dostanî û havalî de, li xwe rexne digirin.



Ev xeletiya, di çerçewa pirsê Beşikçi de nema; bû rewşeke giştî. Di pirsê serekê Belediya Diyarbekirê, têkoşer Mehdî Zana de jî ev xeletiya bûye.

Beriya ku Beşikçi ji zîndanê derkeve, qismek ronekbîr û kovarên demokrat li ser pirs û şexsiyeta wî sekinîn, lêkolîn. Nemaze, piştî ku ji zîndanê derket, pirsê Beşikçi zêdetir aktûel bû. Di wan nivîsan de gelek tespîten hêja hatin kirin. Lê tespîten ku em ne pê re ne jî hatin kirin. Bi taybetî li dora şexsiyeta Beşikçi îdealîzasyonê çêkirin: Ev tişt bi ya min ne li cîh e. Di hundurê xwe de tehlûkekê dixuliqîne. Ew îdealîzasyonê zera-rê bide şexsiyeta wî û doza gelê Kurd. Ez hêvîdar im û pê bawer im, ku Beşikçi dê li dijî wê tehlûkê derkeve. Çimkî, derd û kulên îdealîzasyonê mezin in. Dê mezintir: roj tê, îdealîzasyon, dibe bingeha bêbaweriyê.

Komara Cumhuriyê ya Tirkîyê, tu cara neteweya Kurd û pirsê gelê Kurd qebûl nekir. Ew di nav wextê de bû politîkake edetî. Gelek ronakbîrên Tirk jî, ev bîr û bawerî qebûl kirin, ji bo îdeolojiya dewleta Tirk kirin unsûreke bingehîn. Beşikçi jî Tirk bû. Bi xurtî li dijî wê bîr û bawerîya şaş û ya dijminên gelan derket. Piştî demekê, bû dost û hevalekî gelê Kurd. Roj bi roj xebat û lêkolînên xwe pêş xist: wek têkoşerekî gelê Kurd erk û wezîfên xwe anîn cîh.

Beşikçi, li hemberî politîka dewleta Tirk, wek "ronakbîrekî edetî" hereket nekir. Di vê platformê de, wek rewşenbîrekî modern hereket kir: metoda xwe pêk anî. Lêkolîn çêkirin. Hezar mixabin, di platforma

pirsê Kurdistan û gelê Kurd de, di gelek nêrîn, lêkolînên xwe de û di danîna politîkayê de wek ronakbîrekî edetî hereket kir. Mirov dikare bibêje, ku di vê çerçewê de, Beşikçi "cotstandartî" ye. Tercîhên wî yê politîk jî, gelek caran edetî bûye. Hêz û kesên bi hişkî û sekerî doza gelê Kurd parastine, Beşikçi ew taswîb kiriye.

Beşikçi, ne sosyalîstekî ortodoks e. Heta mirov dikare bibêje, ku di pirsê sosyalîzmê de pragmatîst e. Ji sosyalîzmê îstîfade dike. Pragmatîstiya Beşikçi, ji bo menfaetên xwe yê şexsî qet ne pragmatîste. Fedekar û şoreşger e.

Eger pirtûk û nivîsarên Beşikçi baş werin lêkolîn, ev tişt gelek bi hêsanî derdikeve. Beşikçi, di hemû nivîsarên xwe de, ji "Metoda zanyarî" behs dike. Bi vê metodê pirsên sosyo-

Maliya Bêşikçi, Leman xanim dipeyîve: "Ez hîç ne hizirîm ku ji wî veqetim"

Em, di sala 1966-an de, gava ku wî li zanistgeha Erzurumê kar dikir, zewicîn. Ew hevalê herî nêzîk yê bira-yê min bû. Ez jî wê çaxî mamosta bûm û min di dibistana destpêkî de kar dikir. Ev li ser hev tam bîst sal in ku em zewicîne. Lê di van bîst salan de em bi tenê heşt salan bi hev re mane. Wî berî zewaca me eskerî kiribû. Lê ev payîna han ya bi salan, ji ya eskeriyê qat bi qat bêtir jîna min kot.

Mirov nikare peyv û gotinan bibîne, da ku bikaribe salox bide, ku ew mirovekî çilo ye. Eger hûn wî li ser kevîran jî razînin, deng nake û gilîdar nabe. Ew mirovekî wilo ye, ku min heya niha nedîtîye ku ew ji tiştekî gilîdar û nerazî be. Gelekî li ser çavên xwe dilerîzî û paxava wan dikir. Heçî çav û destên wî bûn, her tiştên wî bûn. Niha çavên wî xerab bûne. Edî her tiştî cot dibîne û ji lewre jî berçavik bi kar dihêne.

Sebr û delîva pêxamberan li ba wî heye. Bi rojan jî birçî bimîne, deng nake. Mîroyan (gêre, mûristang) jî naêşîne. Li malê, li hember min gelekî kubar, rûmetgir û bîhnfireh e. Mirov ku dest nedan pirtûkên, ew dengê xwe dernaxîne. Ew di derheqa pirtûkên xwe de, heta tu bêjî zîz û diltenik e. Ew jê re gelekî giranbiha ne. Ew bi xwe pirtûkxana xwe vedimale, pagij dike û pirtûkên xwe bi pûtepêdan rast dike.

Ew dikeve oda xwe ya xebatê û jê bi rojan dernakeve. Bêf ku xwe birçîbûnê bide bîra xwe, dixwîne, dinivîse û dixebite. Her cure rojname û kovaran dikire û dixwîne. Bi awakî piralî li babetekê hûr dinihêre û vedikole. Ez tevî xebata wî nedibûm. Ewî bi xwe, bi tena serê xwe, kar dikir. Gava ku ew dixebitî, min gelek caran xwarina xwe tenê dixwar. Çu caran têkilî karê min nabe. Li hember min, heta tu bêjî, demokrat e. Çu caran jî

têkilî rojgirtina min nebû.

Têza doktoraya wî, ya ku wî li zanistgeha Erzurumê amade kiribû, di destpêkê de gelekî hate ecibandîn. Wî li ser Eşîreta Koçer ya Elîkan lêkolînek çêkiribû. Lê ew paşê bû bela serê wî. Mamostê wî Îbrahîm Yasa, ji wî gelekî hez dikir. Rehmetî digot; "Min xwendekarekî wek wî hîn nedîtîye".

Herçendî di van bîst salên ku em zewicîne de hejmara salên ku em bi hev re jiyane gelekî hindik bin jî, herçendî ez hinde li dû girtîxanan reviya bim jî, dîsan jî ez rewşê ne gilîdar im. Bi salan bi tena serê xwe mayîn helbet ne hêsan e. Lê welê xuya ye ku ez êdî hîn bûme, çendîn sal e weha ye û ez jî êdî nema ji rewşê dikerixim.

Ez çu carekî nehîzirîm ku ji wî veqetim. Ma dibe mirov di rojên teng de wî terk bike? Bêşikçî jî çu caran pêşniyara hevûdu berdanê nekir. Ji xwe malbata min ji wî gelekî hez dike. Nemaze bavê min rûmeta wî gelekî digire. Wan jî çu caran veqetîna min nexwastin. Li benda wî mayîn erk û wezîfa min e.

Mirov nikare kesitî û şexsiyeta wî, mirovperweriya wî salox bide û meziyetên wî bihejmêre. Kesên ku wî dînasîn, dizanin.

Beşikçî hertim di nameyên xwe de dinivîsî û digot: "Nekeve paxavê, ez baş im". Hîç giliyê rewşa xwe nedikir. Mirovekî zor û xurt e.

Ji her tiştî, zêdetir pirtûk dixwastin. Carina jî kinc. Lê heçî pere bûn, hîç nedixwastin. Eger min jê re bişanda, wî ew digirtin. Mirovekî bêf mesref û lêçûn e. Cigare nakişîne û araq jî venaxwe.

Ji bilî tenêmayînê, min ji rûyê wî çu dijwarî nekişandin. Li cihê karê min jî hîç dijwarî derneketin pêşiya min. Lê belê, gava ku min ji Daîra Xwendin û Perwerdekirina Neteweyî izin dixwast, da ez di rojên serda-



nê de herim dîtina wî, wan ji min re timî caran zehmetî derdixistin. Cara herî dawîn ku min xwast ez di 23-ê nîsanê de herim serdana vekirî, wan îzin nedan min. Min jî hertişt da ber çavan û biryar da, ku herim serdanê. Ji xwe bi tenê di serdanên vekirî de rê didan min ku ez wî bibînim. Bêşikçî jî serdanên kurt yên di paş tîlan de nedixwast. Min tevdareka xwe kir, bilêta xwe kirî. Lê di bîska dawî de min bihîst ku serdana vekirî rakirine. Ji lewre jî min nedikaribû ez herim. Tenê tiştekî bîhna wî teng dikir; karbidestên girtîxanê, namayên ku ji derveyî welêt dihatin, nedidanê. Nûnerên PEN-ê, I-, Têvgirêdana Efûya Navneteweyî û yên gelek tevgirêdanên din yên navneteweyî ji malê rewşa wî dipirsîn. Ew çend car jî hatin serdanê. Gava ku Bêşikçî li malê bû, mêvanên wî gelek bûn.

Ji "Yênî Gündem" (Sal 4, hejmar 64, 24-30 Gulan 1987)

Wergêr: R. Zîlan

Awûkatê Îsmâil Beşikçi Serhat Bucak:

''Ronakbîr cotstandartî ne''

-Gelo tu dikarî di derheqa rewşa hiqûqî ya Îsmâil Beşikçi de me bi kurî ronahî bikî?

-Berî her tiştî divê bidim diyarkirin, ku li Tirkîyê bîrewer û nivîsevanên wek Dr. Îsmâil Beşikçi ku demke dûr û dirêj di girtîxanên têvel de girtî û hukumxwarî jîna xwe domandibin, gelekî kêr in. Dr. Beşikçi ji girtîna xwe ya pêşîn ya sala 1971-an û bi vir de, ji 16 salan tam 10 sal û 10 meh di girtîxanên cihê cihê de derbas kirin.

Herçendî li welatekî dereke hîç nivîsar, afirandin, name û hwd. yên Dr. Beşikçi nehatine weşandin jî ew yekemîn kes e, ku bi tenê ji ber nivîsîna nameyêke bi peywendiyên wî yên şexsî ve girêdayî, li gor madeya 140-î ya Qanûna Cezayî ya Tirkîyê hatiye ceze kirin. Ev tişt gelekî helez e. Bi bawerîya min, ev ceza han, ji ber ku ew li dijî îdeolojiya resmî ye, bi qestî dane wî. Ez bawer dikim, ku dê rojekî li ser tiştên ku Beşikçi nivîsîne, gotûbêjin di zanistgehên Tirkîyê de bêne kirin.

-Aya awira giştî ya cîhanê bi rewşa Beşikçi ve bilî bû? Kê û çilo pê mijûl bû?

-Ji roja ku Dr. Beşikçi hatiye girtin û bi vir de, awira giştî ya cîhanê ew tenê berneda. Nema Tevgerêdana Efqû ya Navneteweyî, Penkluba Amerîkayê, Yekîtiya Nivîsevanên Swêdê, Penkluba Swêdê û Penkluba Fransayê bi awakî manewî jê re xwedî derketin. Wan hertim name nivîsîn, bi pirsgirêkên wî ve bilî bûn. Lê mixabin ji wan nameyan hîç yek nedane wî. Ji ber ku wan libek jê ji min re dişandin, min Beşikçi ji navrokên nameyan aghdar dikir. Ew du caran ji aliyê Penklubê girtiyê mehê hat helbijartin. Di van dawîyan de jî ew ji aliyê du parlamenterên Awûstralyayê ve ji bo xelata Aştiyê ya Nobelê namzê hat nîşandan. Ji bilî vê jî, bi qasî 300 nivîsevan û zanyarên ku li Hollanda, Swêd, Swîsre, Fransa, Almanya Rojava, Danîmar-



ka û Norweçê dijîn û dixebitin, ji bo serbestberdana Dr. Beşikçi jî serekomar, Serekwezîr û Wezîrê Dadmendiyê re nameyêke hevbeş nivîsîn. Hevpeşeyên (meslekdaş) wî, nemaze ''Civata Sosyolojiyê'' ya li Londonê ew tenê nehîştin.

-Gelo Sendikaya Nivîsevanên Tirkîyê, ku Beşikçi jî endamê wê bû, bi wî re eleqedar bû?

-Ez di wê baweriyê de me, ku niha hewa bi mijê hêdî hêdî vedibe. Bi vê re divê hin pirs jî derkevin ber ronahiyê û awira giştî jê bîn aghdar kirin. Sendikaya Nivîsevanên Tirkîyê, ne berî 12-ê îlonê û ne jî piştî wê bi Beşikçi re eleqedar nebûye. Nema tawra serekê Sendikaya Nivîsevanên Tirkîyê Azîz Nesîn û komîteya kargêr helez e.

Ji ber ku Beşikçi di nav şerê li dijî îdeolojiya resmî de ye, Sendikaya Nivîsevanên Tirkîyê naxwaze birûskên îdeolojiya resmî bikşîne ser xwe. Lê çî mixabin e, ku Sendikaya Nivîsevanên Tirkîyê jî para xwe ji 12-ê îlonê wergirtiye û di dezgehên gerandinê awartede hatiye muhakeme kirin. Wek Dr. Beşikçi jî gelek caran destnîşan kiriye, ronakbîrên Tirkan,

zanistgehên Tirkîyê û zanyar hertim bi cotstandartî hizirîne. Di bûyera Beşikçi de jî ev welê ye. Kesên ku di gelek waran de diltenik û dilzîz in, di warê Beşikçi de bédengî û bédengmayîn tercîh kirin. Heta sala 1987-an, yek-dido ne tê de, hîç organeke weşanî û hîç mueseke demokratîk bi wî re eleqeder nebûne.

-Aya tawra Beşikçi ya li hember ''Kampanyayên efûyê,'' ku ji bo wî bûn, çî bû û di vî warî de çî digot?

-Beşikçi ji serî de ne di wê baweriyê de ye, ku wî çu sûc û tawanek kiriye. Ew ji ber dîtinên xwe yên nesûcdar û netawanbar hatiye muhakeme kirin û ceza dayîn. Ji ber ku ew ji aliyê xwe de pêkhatina çu sûc û tawanekî qebûl nake, li dijî kampanyayên efûyê bû. Wî bi xwe beyan kiriye, ku ji çu meqam û kesekî daxwaza wî ya efûyê tune û ji lewre jî divê di vî warî de çu teşebusek nehête kirin. Çu daxwaza wî ya efûyê tune.

Ji ''Yeni Gündem'' Sal 4, hejmar 64, 24-30 Gulan 1987

Wergêr: R. Zilan

Jiyaneke Giranbiha!

Îhsan Aksoy

"Di vê civatê de jiyana serbilind pir zehmet e; lê ji bo me ji vê pêve tu rê nîne. Bi çi awayî dibe bila bibe, divê em serê xwe bilind bigrin."

Ev, di nameke xwe da nivîsîne Î. Beşîkçi.

Di civatên paşdamayî de gelek kes pey nav û nîşanan, pere û polan dikevin. Bi rêya îkbalê digrin. Ji rastiye dûr dikevin. Gelek ji wan rê û firsendan dibînin û di civata kedxuran de ji xwe ra cîkî çêdikin. Lê hinekên ku rê û mecalan nabînin jî, ji bo hestûkê serê xwe berjêr dikin û ji halê xwe re "şikir" dikin.

Bi jiyana çînayetiye ve tevayî halê civatan bi vî awayî ajot û hat û bi vî awayî jî dajo û diçe. Bi gelemperî du rêzên bingehî di civatê da pêşda tên; bindest û serdest. Yê di nav van herdu rêzan da dimînin jî goreyê şert û surtên dinyayê berbi herdu alîyan ve diçin û tên.

Lê kes hene ku bi çi awayê dibe bila bibe li ba bindestan cîh digrin. Ew tim û tim li ba rastiye disekin. Serê wan herdem bilind e. Ev kes, mirovên aza ne. Azadiya xwe bi tu tiştî naguhêrin. Tu qiymeta diyariyên kedxura; bertîlên zulumkar û xwînxwaran ji bo wan nîne. Ew kes penya sola xwe bêsekinandin li nav û nîşanên derewîn dixin. Ji bo wan pere pol û jiyaneke vikûvala rûreşiya mezin e. Dilê wan ji bo bindestan dikute. Serê wan tucaran berjêr nabe. Tucaran li erdê nanihêrin. Dengê wan gur û bilind e. Li pêşiya xwe tu qeyd û bendan qebûl nakin. Ew baş dizanin ku li pêşiya mirovaniyê jiyaneke bêserî û bêbinî, ronak, wekhev û aza heye. Wê jiyane jî kesên bindest di çenga destê xwe de digrin. Ew dizanin ku "şert nîne ku emrê mirova dirêj bajo.", lê divê "mirov wek mirovan bijî û ji jiyana xwe têr be." Helbet bedelê jiyaneke



azad giran e. Helbet bihayê azadiyê heye. Lê mirovek berî her tiştî bixwe azad nebe, ew nikare qala azadiya kesên din bike. Ji bo ku berî her tiştî mirov bikaribe xwe azad bike, divê mirov gelek tiştan qebûl bike; tunêbûn, birçîbûn, tenêbun, zindan, êşkence, girtin û berdan û hwd. dibe parek ji jiyana mirovê azad. Lê ew wek hesinekî sorkîrî çiqas tê kutanê, ewqas berk dibe, ewqas ji jiyana xwe têr dibe, ewqas bilind û serfiraz dibe. Dengê wan digihêje dewsa xwe. Dûr yan nêzik ew dibin çavikek ji kanîya serfiraziyê. Rûmeta ku li ba xwînxwura nedîtin e, di dilên bindesta de dibînin. Dibe ku di saxiya xwe de bedelê kîrinê xwe yê giranbiha nebînin. Lê ew dizanin ku dûr yan nêzik kîrinê wan bênebe dê dewsa

xwe bibînin.

Helbet her kesek nikare bibe "mêrê rojên teng", ji her kesî naye ku rehetiya xwe bi destê xwe va dave. Lê di dinyake hov û xwînrêj de kesên weha rûspîtiya mirovaniyê ne.

Di bin hukumdariya hovan de!

Ji dehsalan û bi virde li Tirkiyê hukumdariya hovan didome. Ne hewce ye ku em behsa dema Osmaniya bikin. Lê ji dema M. Kemal -ku Tirk xwe pê dipesinin- heya îroyîn hukumdariya hovan li Tirkiyê didome.

Kemal û hevalên wî zanyarî û rastî înkâr kirin. Bi nijadperestîke kevna-

re dest bi kar kirin. Mirovatî, rastî û zanyarî serobino kirin. Hukumdariya kedxuriyê saz kirin. Dîroka Tirkan bi derewan nivîsîn û dane xwendinê. Nesla nû bi derewan hînkirin. Nehîştin ku mirovên têgêhiştî bigihên. Xwestin ku fikrên xwe yê nîjadperest û şoven bi zorê bidin qebûlkirin. Kesên ku ew fikir qebûlnekirin, ji civatê hatin qetandin. Derûdorê Tirkiyê ji gel re girtin. Mirovê vira bi vî karî hînbûn û neslek bi vî karî westirî. Li dinyayê ecebeke wisa kêmtê dîtîne. Hertîşt hate înkarkirin. Çîna-yetî û tekoşîna çîmî, fikrên têvel û hebûna gelên din hatin înkarkirin. Dîroka Tirkan ya dema Osmaniyan kirin kana pesindariyê.

Mêjûyê mirovan bi kêrê hate sîwax kirin. Bi vî teherî neslên nû gihîştin. Çand, edebiyat, tarîx û hwd. ketin nav çarçova Kemalîzmê. Kesên ku rastî didîtin û dixwestin wan rastiyan bibêşin, hatin girtin. Ji nivîskar, hunermend û zanan re du rê hebûn; yan wê deng nekirana, yan jî wê bike-tana êşkence û girtîxanan.

Kesek nedikarî li ber vî zilm û tadayê bisekine. Ya xirab ew bû ku gelek kesên ku xwe pêşverû û şoreşgêr an jî komûnîst dihesibandin, li dijî Kemal û hevalbendên wî tucar tişteke negotin, bi ser de jî carna pesnên wan dan. Kemal û ordiya Tirk bi "şoreşgêr" hate navkirin. Demeke dîrûdirêj bi vî awayî ajot û hat. Mêjûyê zincîr kirî rexet rexet nikare xwe azad bike!

Salên 1960-î rewşa Tirkiyê parîkî nerm bû. Gelek tişt hatin nivîsandin. Gelek tiştên nû derketin ortê. Tirsa li ser însana kêmtê bû. Kitêbên pêşverû, lîteratûra sosyalîzmê yê klasîk bi zimanê Tirkî ronahî dît. Partiyên pêşverû hatin sazîkirin. Bere bere hin kesan, di hin weşanan de qala Kurdan kirin. Di hin weşanan de bi zimanê Kurdî helbest an kurtenivîsar derketin.

Ronakbîr û zanayên Tirkan xwestin ku ji nû ve dîroka xwe bikolin û enene bikin. Xwendevanên xwendina bilind guhê xwe ji dinyayê re vedikirin. Êdî herbere mesela Kurdan derdikete pêşiyê. Di civînan de gelek bi dengê bilind mafê gelê Kurd û hebûna wî tanî ber çavan. Bi mese-lên sosyalîzmê va tevayî pirs Kurdan

jî êdî derdikete pêşiyê. Civatên Kurdan û Tirkan ji binî ve dilivîyan.

Lê belê ev yeka naye wê maneyê ku nivîskar, ulmdar, karbidest, ronakbîr û hwd. li Tirkiyê êdî xwe ji şert û şurtên kemalîzmê xilaz kiribin. Nexwêr! Her çiqas gelek kesan gelê Kurd dinasî, yan jî weha digot, dîsan jî mêjûyê nezincîr kirî pir hindik bûn. Heya derecekî mirov diaxivîn, lê ji derecekî bi şûn de kemalîzmê pêşî li pirsê digirt. Bi salan û salan hin tişt bi teherkî hatibûn hînbûnê. Bi dehsalan gelek tişt hatibûn înkarkirin. Ji dehsalan û bi virde gelê Kurd û hebûna wî hatibû bîrkirinê. Di dibistanan de her roj pesnê Tirka hatibû danê û her kes Tirk hatibû hesibandîne. Di çend salan de ev rewşa helbet nedihat guhurandin. Xên jî vî yekê nermbûna hukumeta Tirk jî zêde najot û dîsa girtîxane û îşkencexane bi pêşverû, welatparêz û demokratan ve hate tijîkirin.

Derheqa Kurdan û pirs Kurdî de ronakbîr û pêşverûyên Kurdan serî dikşandin: ger di nav Partiya Karke-rên Tirkiyê de û ger di nav xwendevanên zanîngêhê de; yan jî di meş û civînan de. Welatparêzên Kurd derdiketin pêşiyê. Hilbet em nabêjin ku ji pêşverûyên Tirk kesî maf û hebûna Kurdan nediparast. Hilbet diparastin. Lê belê bi dehsalan ve wisan bibû ku bi hêsaniyê tu kesekî nekarîbû şert û şurtên kemalîzmê biqelîşîne. Di derheqa pirsê netewî de hê hindik tişt dahatin zanîn. Yên ku li derevayê Tirkiyê xwendin kiribûn, an jî serokên partiyên bûn jî, yan bin tesîra Kemalîzmê, yan bi hesaba polîtîk, yan jî ji tirsê, rasterast pirsê netewî û wisan jî pirsê Kurdan netanîn zimên.

Di vî demê da Î. Beşîkçî, li Erzurumê xebatên xwe yê ulmî hazir dikir. Ew ji bo vî yekê li gund û bajêrên Kurdistanê geriya. Li ser Eşîra Elîkan -ku eşîreke koçer bûn- lêkolîn çêkir. Û bi vî lêkolîna xwe bû doktorê sosyologiyê. Bêşîkçî êdî gihîştibû şûna xwe û kaniya xwe dîtibû.

Gelo tenê zanebûn bes e?

Sosyolog, antropolog, rohilatzan, dîrokzan, cografîzan û hwd. li Tirkiyê pir in. Û gelek ji van xwe pêşverû,

welatparêz dibînin. Di nivîsar û kitêbên xwe de qala sosyalîzmê dikin. Lê belê ji vana tu yekê pirsê Kurdan hîlneda zimanê xwe. Mesele sala 1969-an de li ser kitêba Dogan Avcioglu "Nîzama Tirkiyê" dihat enekirin. Hema hema bi yekdevî çep û ronakbîrên Tirk pesnê xebata Avcioglu didan. Bi rastî jî heya wê demê ew xebata xebateke bijarte bû. Lê têda pirsê Kurdan tunebû. Î. Beşîkçî, di rojnama "Halkçi" (Ku li Enqerê neşir dibû) de li ser kitêba Avcioglu miqalek nivîsî û ev miqala di çend hejmarên wê rojnamê de neşir bû.

Bi kurtî, Beşîkçî dinivîsî ku kitêba Avcioglu kitêbeke kêmtê e. Ev kêmasiya jî bi zanebûn çêbûye. Ji ber vî yê jî ev kitêb û gotinên wê rast nînin. Pişt vî miqalê kîngê ku Avcioglu çapa kitêba xwe ya duyemîn neşir kir, parek jî ji bo pirsê Kurdan ya netewî têda çîh girtibû. Helbet ev para pir kin û kêrnehatî bû. Lê belê Avcioglu li ber gotinên Beşîkçî xwe mecbûr dît û ev para li kitêba xwe zêde kir. (Di çapên din de jî ev par jî kitêbê derxistin.)

Beşîkçî 1969-an de kitêba xwe ya nû derxist. Paşê ev kitêba bi navê "Rewşa Anadolîya Rohilat" mezin û fireh kir. Beşîkçî êdî raste rast pirsê Kurdî hildabû dest xwe. Dîtina wî bi kurtî di vî kitêbê da weha bû: "Mîntîqa ku îro jê re Anadolîya Rojholat û Anadolîya Rojhilata Nîvro tê gotin, tê de gelê Kurd dijî. Hebûna wî gelfî -ku tenê di nav sînorên Tirkiyê de bi milyonan in- tê înkarkirin. Lê belê bi zor û zilmê, bi dek û dolaban, bi derew û xapandinan hebûna tu miletekî ji ortê ranabe. Ev mimkun nîne ji ber ku tişteki weha dijî ulm û rasti-yê ye.

Gelê Kurd ne tenê di nav sînorên Tirkiyê, lê wisan jî li Iraq, Îran û Suriyê hene.

Dewleta Tirk ji ber ku ji xwe re mecalên aborî yê nû çêbike, mecbûre ku bîngihiyên aboriya kapitalîzmê bibe mîntîqa Kurdan. Wê demê bibe nebe li wir dê kapitalîzmê herbere hukumdariya xwe saz bike. Bi hati-

na kapîtalîzmê re ronakbîr û xwendeyên Kurdan û wisan jî karkerên Kurdan dê bi hejmar zêde bibin. Dinya îroyîn de ewê gelek tiştan hîn bibin û li gelê xwe xweyî derkevin. Bi vî karî em bixwezî an nexwezî gelê Kurd dê mafên xwe yê netewî bixweze. Ger mafên wan bête dayîn, mimkun e ku ev pîrsa bê şer bê helkirin. Lê ger mafê wan yê netewî nedîn wan; em bixwezî, an nexwezî dê serî rakin. Bi kurtî bi zor û zilmê ev pîrsa nayê safîkirinê.

Kitêba Beşikçi di demeke kurt de hate naskirin. Li her aliyê Tirkîyê û Kurdistanê ev kitêb hate xwendin. Paşê Beşikçi li gelek ciyan dest bi semîner û konferansan kir. Bi xwendevanên Kurd yê xwendina bilind ve bûne nasî hev.

Di sala 1970-î de li Enqerê di loka- la DDKO de li ser pîrsa Kurdan semî- nerek pêşkêş kir. Gelek Kurd û Tir- kên pêşverû di vê semînerê de beşdar bûn. Ewî raste rast pîrsa Kurdan anî ziman, bi zelalî fikrên xwe got û ber- sîva pîrsên beşdarî da. Bi dû ve semînerê, semînerê jî di loka- la PDA yê de pêşkêş kir. Endamên PDA yê û yê ku li vê semînerê beşdar bibûn dîrûdirêj dîtinên xwe anîn ziman. Qala dîroka Osmaniya kirin. Sedemê serî hildanên Kurdan anîn ziman. Ji marksîzîm û Lênînzîmê kurtewîsar xwendin an gotin. Pîrsa netewî û wisan jî pîrsa Kurdan enekirin. Di dawîyê de Î. Beşikçi axivî. Bi bîr û bir- yar û bihêrs; ew kesên ku li wir beş- dar bûn, gunehkar kir. Bi kurtî weha gote wan; "We ev çend saet in ku qala dîroka Tirka, qala mesela nete- wî û qala sosyalîzmê kir. Lê ez jî divê ji we pîrsê bikim: Gelo hûn ku ewqas zana ne; hûn ku xwe pêşengên şoreşa Tirkîyê ya sosyalîst dibînin. Û hûn dixwezî ku bi her awayî Tirki- yeke demokrat ji nû ve saz bikin. Gelo we heya niha ji bo nasîna hebû- na gelê Kurd û ji bo mafên wan yê netewî çî kiriye û we di derheqê ve pîr- sê de çî anîye. Di salonan de û di nav hevde dîrûdirêj xebirdan tu tiştê nîne. Kesên ku bikaribe ji xwe re bêje ronakbîr, demokrat, yan pêşverû, yan jî sosyalîst, divê berî her tiştî bikaribe xwe ji şert û şurtên Kema- lîzmê xilas bike û hebûna gelê Kurd û mafê wî yê netewî biparêze. Bêjin çika we heya îro çî kiriye ku hûn îro

ewqas dixafî? Tesîra van gotinan gelekî mezin bû û demekê ji tu kesî deng derneket. Xên ji semîner û kon- feransan ew diçû ba mamostayên unî- versîtê. Bi wan re dixafî. Pîrsa Kur- dî dida pêşîya wan. Û raste rast digot: "Tenê zanebûn ne tişteke. Divê miro- vê bi rastî zane ye, tiştên ku rast diza- ne, bi dengê bilind bêje. Ger ew zane- bûna xwe tenê ji xwe re bihêle, qiy- meta wê zanebûnê hiç nîne.



Rojên teng, reş û sipiyê ji hev diqetîne!

Di meha Adara 1971-î de leşker dest danî ser îdara dewletê. Zindan û îşkencexane bi însanên ronakbîr, pêş- verû, welatparêz, sosyalîst û demoq- rat tijî bûn. Helbet wan kirinên Beşik- çî jê re nedihîştin. Beşikçi xistin gir- tîxana eskerî ya Diyarbekirê. Li wir di nav gundî, xwendevan û ronakbî- rên Kurdan de Beşikçi xwe gelekî kêfxweş dîdît. Bi çavên xwe dîdît ku gotinên wî rast in. Ji her tebeqeyên Kurdan welatparêz çêdibûn. Û ew niha li ba wî bûn. Qiymet û rûmeta Beşikçi li ba girtiyên Kurdan gelekî bilindbû. Lê Beşikçi jî îsbat kir ku ew mêrê rojên teng e. Berî her tiştî paras- tîna xwe hazîr kir. Di mehkemeyên eskerî de bi bîr û bawerî; bê tîrs û mêranî gelê Kurd û mafên wê yê

netewî parast. Ji Unîversîta Erzuru- mê gelek muxbîr hatin û li ser wî şahî- dî kirin. Ew guhnekar kirin. Lê Beşikçi li hember rebenî û perîşaniya wan profesor, doçend û doktoran kenîya. Bi zanyarî û mêranî li gotin û nivîsarên xwe xweyî derket. Mîli- mek gav paş de navêt.

Mehkema eskerî û şahidan li ber xwe nihêrin. Li ber wan guzeke hişk hebû. Girtîxane, ji bo zane û mêrê roja teng, mirovê bi bîr û biryar, Î. Beşikçi bû dibistan. Ewî dest bi hîn- bûna zimanê Kurdî kir. Xên ji vê, hazîriya xwe dikir ku gava derkeve derva, yan jî mecal bibîne, dîtinên xwe yê nû neşîr bike. Tek saeteke wî vala derbas nedibû. Yan dîxwand, yan dîvîsî, yan jî bi hin kesan re li ser pîrsa netewî û pîrsa Kurdî enene dikir.

Çî bibû çî nebibû. Kîjanan paş ve gav avêtibûn û kîjanan xwe bê pêş ve birî- bûn. Reş û sipî ji hev qetyabûn. Beşikçi jî vê îmtîhana yekemîn bi rûsi- pîti û bi dereca bilind derketibû.

Di sala 1974-an de bi efa giştî re Beşikçi jî ji girtîgehê derket. Deme- ke nû destpêkir. Beşikçi xwest vege- re unîversîtê. Lê îdara unîversîtê ew qebûl nekirin. Mehkema şewrê ya dewletê (daniştay) biryara unîversîtê red kir. Lê dîsa jî ew nehiştin. Ji bo wî vegeer an nevegeer unîversîtê ne xem bû. Tenê ewî dixwest ku pey wan keve û îsbat bike ku li Tirkîyê ji bo zanayên rastî çî nîne.

Paşê dest bi xebatên xwe kir. Pozê tîrê xwe zivirande kemalîzmê. Bi rastî jî heya kemalîzm eyan beyan çî xwe yê rast nedîta, hê gele wext dê badî- hewa wînda bibûya.

Bi "Avaya zanyariyê" destpêkir. Paşê li ser CHF sekinî. Teoriya ziman û tarîxa Tirk -a ku bi derewan hatibû nivîsîn- hilda dest. Îskana Mecburî ya Kurdan kola. Zilmkariya dewleta Tirk ji serîda hilda û anî. Bi bîr û bawerî, bi zanebûn û mêrxasî rimên xwe avête şovênîzma Tirk û kaniya nijadparêzî û zilma kemalîzmê. Li ser hev jê re dawê vedikirin. Lê ji bo wî ev nedibû sedemê sekinandinê. Zan- yarî û mêrxasî ji bo heta hetayê bû. Ewî xwe deyndar dîdît. Tirkên ku xwe ronakbîr dîdîtin, çep û demok- rat dîdîtin, tu deng dernedixistin. dîroknas, sosyolog, etnograf, antre-



polog, rojnamevan û hwd. tu carî qala Kurdan nedikirin û ev yeka Beşikçi aciz dikir. Ew ecebmayî dima; çawan mirovek xwe zana bibîne û behsa hebûna Kurdan neke? Lingekî wî li mehkeman, lingê din li ba nivîskar û pisporan bû. Serokê koma nivîskarên Tirkiyê di axeftinekî xwe de ji Bêşikçi re heqeret kir. (Niha ev kesa li Evropayê civînan çêdike û qala gelê Kurd û mafên wî dike.)

Zanyarî û mêrxasî tenê ji bo demekê nîne!

Prof. Dr. Türkkaya Ataöv ku xwe pisporê şerê azadiya gelên bindest dihesibîne, di nameya xwe de dîsa dev avête Beşikçi. Lê Beşikçi bi zanebûn û mêrxasiya xwe herbere bilind bû, herbere berk bû û xwe bi dost û dijminan da qebûl kirin.

Berî cunta eskerî, gelek kesan xwestin ku ew derkeve derva. Lê ewî bi bîr û biryar ling kuta erdê û got, "Nexêr! Ez dernakevim dervayê welêt. Û çima derkevim. Ezê li her derî û di her firsendî de eyba Tirkan bidim rûyên wan û ewan mahkum bikim. Ew bi min nikarin. Ji ber ku ew derewan diparêzin, ez rastiye. Ev sera di nava derew û rastiye de dom

dike. Ez jî tekoşerek im ji bo rastiye û li dijî derewan."

Tekoşîna Beşikçi di girtîxanan de domkir. Ewî dîsa gotinên xwe bi bîr û bawerî, bi zanebûn û mêrxasî li dijî mehkemeyên faşîst parast. Hebûna gelê Kurd û mafên wî yê netewî anî ziman. Kemalîzm mahkumkir. Ji serokê nivîskarên Swîsre re namek şand. Li hember zilma li ser Kurdan, bê dengiya nivîskarên Evropayê li rûyê wan xist. Rexne li wan girt. Beşikçi ger kitêb û nivîsarên xwe piştî sala 1974-an û ger jî parastina xwe û namaya ku ji serokê nivîskarên rastî îdeolojiyê dike. Bi kurtî dibêje "Îdeoloji dijî ulmin. Qerimîne. Nahêlin mirov azad bifikre û azad bêje. Çerçovakî diçixizîne. Kê ku ji vê çarçova çixiskirî derkeve, tê ceza kirin. Kemalîzm jî îdeoloji ye. Îdeolojiya burjuvaziya Tirkan e. Kemalîzm, nîjadparêzî û dijminiya gelan e. Kemalîzm parastina statukoyê ye. Kemalîzm kolonyalîst û faşîst e. Ji bo pêşdeçûyîn û demokratbûna Tirkiyê divê kemalîzm bête mahkumkirin û pelçiqandin. Rewşenbîr, pêşverû, demokrat, sosyalîst, zana, nivîskar û hwd. yê Tirk bi du standardan difikirin. Ji bo Tirkan azadî û demokrasî dixwazin lê hebûna gelê Kurd înkâr

dikin. Jo bo Tirkan ronakbîr in, lê ji bo Kurdan kemalîst in."

Beşikçi berdane. Ewî ceza ku mehkemên faşîst dabûnê, kutakir. Lê wê car din kîngê bigrin em nizanin. Ji bo Beşikçi hundur, yan derva ne xem e. Ji ber ku ew xebatên xwe dikare di Swîsre re şandiye de, pozê tîrê xwe hundur de jî bidomîne. Beşikçi bi toza sola xwe ve rojnamevanên Tirk re got: "Li ser Kurdan zilm domdike. Ronakbîr, nivîskar, pêşverû û demokratên Tirkan jî rêya xwe ya bi du standarda neterikandine û li ber zilma ku li Kurdan tê kirin deng dernaxin. Di girtîxanan de -ku ev derçihên ku dewlet tê de pir xurt e- kî ku nebêje ez Tirk im; tete kuştin." Û diyar kir ku "Xebatên min yê nû hene û ezê wana neşir bikim".

Beşikçi ne ku Tirk e, lema mirov jê re kêfxweş dibe. Ev yeka ji bo mirovekî zana û mêrxas ne li ciye. Ew ji kîjan mîletî dibe bila bibe. Ew î. Beşikçi ye. Ronakbîr, Zana, mirovê bi bîr û bawerî; bi biryar û mêrxas e. Ew ji bo gelek kesan bû mîsaleke bêhempa. Ewî derseke zor da kemalîstan, pisporên kemalîst, tirsok û bizdok êdî xwe nikarin weşêrin.

Çi bêjim ji bo Beşikçi? Dibê dêyan çî ewlad welidandine. . .

Dr Îsmâil Bêşikçî

û

12-ê Adara 1971-ê

Awûkat Gülfer Güçlü

Di salên 1970-yî de, hem li Tirkîyê û hem jî li Kuridstanê zordestî, îşken-ce, zîndan, tirs û zordarî xurt û di-jwartir bûbû. Gerandina awarte jî bûbû tokeke agir û ketibû stûyê gel. Ew sal, êdî dibûn destpêka adeta her deh salê carekê destdanîna ser mîri-yê ya leşkerên Komara Tirkîyê û her-weha pê re xurt û di-jwartir kirina zor-keriyê. . .

Di wan salan de, bûrjûwaziya Tir-kiyê bi riya berdevkê xwe Nihat Erîm bi Tirkîyê û cîhanê dabû zanîn ku "Em ê weke balyozekî li serê wan bixin û wan biperçiqînin". Heçî bal-yozên ku wî behs dikirin, ku ew jî zîn-dan, îşkencexane û qerekol bûn, ji mêjve dest bi karên xwe kiribûn. Dadgehên wan jî xeleka dawîn ya vê zincîrê bûn. Ez û hin kesên awûkat yê wî min jî dixebitîn da ku heval-ên xwe bi tenê nehêlin. Yek ji wan hevalan yê ku tenê ne hatibû hiştin jî Dr. Îsmâil Bêşikçî bû.

Dr. Îsmâil Bêşikçî bi afirandina xwe ya "Rista Rojhilata Anadolîyê" ve, ku gava wî li zanistgeha Erzuru-mê kar dikir hazir kiribû, ketibû ber diranên çerxa "Îlahan". Ji wê rojê û bi vir de, wan "awirên xwe ji ser wî neguhastine û di parêzgeriya xwe de çu dirixî nekirine". Wan, ew çend caran girtin, bi gişt çavsoyîyên xwe ve ew muhakeme kirin, ceza danê û ew avitin zîndanê.

Cara pêşîn bû ku min ê ew bidîta. Min xwe dilezand da ku ez xwe bigi-hînim muhakemê. Gava ku ez bi vê heyecanê ketim hundirê salona muhakemê, endamên desteya dadge-hê ji mêj ve li cîhê xwe rûniştibûn. Heçî salona muhakemê bi xwe bû, vik û vala bû. Guhdêrek jî tê de tune bû. Lê belê, li cîhê girtiyar yekî hûrik û

piçûk î zerik li rêza piştê ya çepê rûniştibû. Ji ber ku hevalên din yê wî awukat bi dabaşa wekaletnamê û bi karûbarên din yê Dr. Îsmâil Bêşik-çî ve mijûl bûbûn, min û wî me hîn nasiya xwe nede bû hev. Lê, li gor xeyalkirina min, Bêşikçî mirovekî girs î wek dêwan bû û diviya bû ew yekî wek bi dêwan jî bûya. Min bi vê xeyalê, bi awakî ecêbgirtî li girtiyê rûniştî nihêrî û ji desteya dadgehê pirsî û got: "Ma ev ne dawa Bêşikçî ye?" Gava gotin "Belê", ez derbas bûm, çûm û li cîhê ku ji me awûkatan re hatibû veqetandin, rûniştim. Lê belê, ez yek car ecêbgirtî mabûm û min bi xwe ji xwe re digot: Hela hela! Çilo dibe? Mirovê ku diviya bû girs û reş î esmer ba, çilo dikare holê di quncikekê de bêdeng û bêpêjn rûne. A rastî, pûk û bagerê dil û hinavên min dabûn ber pêlên xwe. Yek ji hoy û sebebên vê pûk û bagerê jî, di salonê de hîç tune-bûna guhdêrekî jî bû. Di rastiye de, dê hin heval wek guhdêr bihatana muhakemê! Ne xwe negihîştibûnê.

Piştî ku dadger hin dabaşên nivî-sînê bi cîh anî û nasnemeya wî tespît kir û qedand, derbasî jêpîrsînê bû. Vegeriya ser Dr. Bêşikçî û jê pirsî: "Ez welê bawer dikim ku tu di pirtû-kên xwe de ji gelê Kurd çêl dikî. Gelo tu dikarî vê yekê ji me re piçekî ronahî bikî?"

Dr. Bêşikçî bi awakî liserxwe û bê deng ji cîhê xwe yê li rêza paşîn ya di quncikê de rabû. Bi eynî bêdengiyê hat û derbasî rêza herî pêşî bû. Dîsan bi eynî bêdengiya xwe ve lê vegerand: "Gelo ez dikarim niha ji we tişteki bipirsim?" Dema ku dadgerê muha-kemê "Kerem bike" got û îzîn dayê, wî bi qelema xwe ya di destan de li caxên reş yê wî hesinî, ku ji bo xuyaki-rina tuxubê di navbera girtiyar û des-teya muhakemê de bû, xist û pirsî: "Begefendîno, gelo ev cax ji hesin in,



ya ji sifir in yan jî ji zîv in?" Dadger ne dîzanî mebesta vê pîrsê çî ye û şaş bû. Hema bersiv da û got: "Helbet ji hesin in." Bêşikçî pîrsêk din pîrsî: "Baş e begên min, gelo hûn dikarin ji van re bibêjin ew ji sifir yan jî ji zîv in û bi vî awayî eslê wan biguhê-rînin?" Dadger dîsa bersiv da û got: "Helbet na, ez nikarim bibêjim." Bêşikçî: "Belê begên min, çawan ku hûn mecbûr in eslê tiştan rast bibê-jin, ji bo min jî welê ye. Ez zanîya-rek im û bi zanistê ve bilî dibim. Ez mecbûr im esl û rastiya tişt û qewi-mandinan bibêjim. Ez, wek zanyarên paşverû heta îro kirine, mîna îdeolo-jiya resmî kiriye, nikarim gelê Kurd yê heyî, tune bihesibînim û wan Tir-kên çiyayî bi nav bikim. Ev kira han ji zanistê dûr e û lê nayê." Wî bi dûr û dirêjahî, bi hûr û kûrtir behs kir û bi nêrevaniyên xwe yê wî di nav eşîre-

ta Elîkan de bidestxistî ve da ber çavan, ku ew çilo gîhaye emcameke weha. Wek endamên desteya muhakemê, min jî ew bi hewes guhdarî dikir. Ew xeyalşikestina min, ya ku di destpêkê de li min qewimî bû, êdî ji navê rabûbû. Bêşikçî, vêca bi rastî ronakbîrên Kurdan li hember wî wer-girtibûn jî, bi tolerans û xweşbîn bû.


Di girtîxana gerandina awarte ya Diyarbekirê de qewimandineke ku bi "Bûyera 2-yê Adarê" nav daye, rû da. Roja 1-ê Adarê ji MÎT-a Diyarbekirê hin karbidest dihên girtîxanê û dixwazin hin xurtên girtî yên ku di lîseyê de dixwendin, hildin û bibin. Girtî jî naxwazin wan teslîm bikin. Li ser vê girtî dest bi liberxwedanê dikin. Lê berpirsiyarên MÎT-ê û yên girtîxanê wê şevê, di saet 5-an de, bombên histir(rondik) barandinê diavêjin qoxûşan û bi vî rengî girtiyan derdixin derve. Çaxa ku girtî xwe davêjin der, heta bêjî, li wan dixin. Heçî Bêşikçî ye, esker wî ji muameleke taybetî ya lêdanê derbas dikin. Ew ji alkîfê de hem bi tinaz jê re "Ma tu jî Tirk î, ma tu jî mamostê zanistgehê yî!" dibêjin û hem jî bi lêdan wî dixin nav 32 kesên ku ji bo lêdan û îşkencelêkirinê hatine helbijartin. Bi dû re ev 32 kes jî îşkence û lêdanên taybetî dihên derbas kirin û wan diêxin hucran. Wê çaxê, hin kes "me çima girtî teslîm nekirin û me çima rê da van bûyeran" dibêjin û poşmanbûna xwe didin diyar kirin. Dest bi hevûdu gunehkarkirinê dikin. Bêşikçî wê çaxê di vî warî de li dijî wan derdikeve. Dide xuya kirin ku ji teslîmbûnê çu netîce nahête wergirtin. Jî di çavên min de bûbû dêwek. Dêwekî welê ku dê ji wê rojê û pê de hîç reşahiyekê nikaribûya ew di sîha xwe de veşarta. Ji ber ku Dr. Bêşikçî bi dil, tevger, hiş û remana xwe ve mirovekî mezin bû.

Muhakemên Dr. Bêşikçî yên piştî vê bêtir bi rêkûpêk derbas dibûn. Di hemû muhakemên wî de guhdêrên wî yên ku ew ji dil hez û destek dikirin, kêman nedibûn.

Di ser jîna wî ya girtîxanê de sal derbas bûn. Heçî Bêşikçî bi xwe bû, mirovekî rehet û ne bi lez bû. Di girtîxanê de ji kesê girtî re madî û mane-wî alîkarbûn, kesên nexwende hînf xwendin û nivîsandinê kirin, bi gundiyan re danûstandina xwe pêşdebi-

rin û ew jî aliyê siyasî de hişyar kirin û her wiha ew hînf bervedêriya di muhakemê de kirin ji erk û wezîfeyên wî yên serekî bûn. Wî jîneke bi bêfî xwestekeke taybetî û bi bêfî yekî din re bûn bar, dabû ber xwe. Di nav daxwazên wî de kaxez, pirtûk û belgeyên di dosyaya wî de cîhê serek digirtin.

Ez ê dîsan ji jîna girtîxanê serpehatiyeke me ye taybetî vegêrim. Wî di serdanekê de, bi şahî: "Gulferâ min, dizanî eta(xwîşka) te Leman dihêt", got. Ez jî bi vê nûçeyê şabûbûm. Lê belê, di wan rojande hawa gelekî nexweş û pîs bû. Çiqil û guli-



yên daran ji sermê qeşa girtîbûn û bûbûn zembelîq. Sermake gelekî di-jwar hebû. Serma di bin sifirê de gîhabû 25 derecan. Trêna ku eta Leman tê de bû, li Paxir Madenê asê mabû. Nikaribû ji wir derbasî Diyarbekirê bîba û bihata roja serdana normal. Ez sibetirê rabûm û wek awûkata wî çûm serdana wî, da ku bi wî bidim zanîn ku eta Leman nikare bigihêje ser roja serdanê. Gava ku min ew ji rewşê agahdar kir: "Hey lo, çi hatiye serê feqîrê", got. Ew wê çaxê, bi delîv û sebr, di hiviyeke de bû. Her çendî li ber xwe diket jî, disan jî ew li ber dilê min geriya û ji min re got: "De li ber xwe mekeve lê! Bila selametî be. Çewan be ew ê bêt, bigihêje serdana didwan". Ew tevî ku mirovekî hinde bi hest û lêbanîn bû, lê di eyn xetê de jî li hember diwariyên jîne mirovekî xurt û xwînsar bû. Di hin rewşande mirov ecêbmayî dima

û digot qey ew ne mirovekî ji goşt û hestî ye. Ew, heta li hember helwêst û tawirên neheq, yên ku bi taybetî hin Bi awakî eşkere piştî liberxwedanê digire.

Me di dema domkirina dawê de dît ku hêla dijmin hîç vala nasekine. Kadroyên faşîst yên di zanistgeha Erzurumê de heyî, ji rektor heya bi dekan, hîç vala nesekinîne. Li ser Bêşikçî zabît girtine, li wî hildane û muxbirî li ser wî kirine. Bi belgeyên li dijî wî ve dosye tijî kirine. Di nav kesê ku ev tişt birêkxistibûn de, her wekî ji belgeyên îxbarî û îfadeyên di dosyan de jî nîşan didin, ku Yılmaz Durak ku îro ji kadroyên MHP-yê û ji desteya Qurmeyê ye, cîhê serekî digirt.

Ji bo me êdî eşkere bû, ku dê xwe-diyê dewletê, nijadperest, faşîst û kemalîst bûyera Bêşikçî efû nekin. Ji ber vê yekê jî, Dr. Bêşikçî, hem di 12-ê Adarê û hem berî û piştî 12-ê Îlonê de jî behra xwe wergirt. Li wî îşkence û zordestî hatin kirin, bi çavekî nizm lê hat nihrîn. Hewl dan da ku wî bêfî destek û piştîvanî bihêlin. Wî 11 sal ji jîna xwe, hem jî salê xwe yên herî bêrdar, di girtîxanan de derbas kir. Lê dîsan jî ji desthilanînê ne ket. Wî ji desthilanînê neketina xwe, roja ku ji girtîxanê derket, peyî-tand. Wî bi hilkeftina ji girtîxanê derketinê beyanek rojnamevanî da û bêfî dudilî eşkere kir, ku azadiya wî bi azadiya gelan ve û bi azadbûna hemû welatparêz, şoreşger û sosyalîstên girtî ve girêdayî ye. Her weha wî, bi daxuyanîkirina domandina karê xwe yê teşhîrkirina îdeolojiya dewletê ve, ji dewleta kolonyalist re careke din meydand xwend. Zanyarên ku bi navê zanîstê, zanîstê vedikujin, vexwende meydana şerî.

Min çu şik û guman nîne, ku dê Bêşikçî bi ser keve.

Wergêrê ji tirkî:

R. Zilan

Dûmahîka rûpel 7

**Metoda zanistê**

Bikaranîna wê ya li Tirkîyê: I
"Mecbûrî İskana" Kurdan
 Weşanxana KOMAL, adar
 1977, 250 rûpel, Stenbol

Ev pirtûka pêşîn ya zencireya "Metoda zanistê, bikaranîna wî li Tirkîyê" ye. Beşikçi, di vê afirandina xwe de, li bûyereke giring ya di dîroka Kurdistanê Bakur de qewimiye hûr dinihêre. Ev bûyer bi kutleyî ajotîna Kurdan û li derveyî Kurdistanê îskankirina wan ya mecbûrî ye. Mistefa Kemal ji salên 1927-an û pê de hin qanûnên sirgûn û ajotinê derxistin. Di nav van qanûnan de qanûna "Mecbûrî İskan"ê ya hejmar 2510, ku di 13.6.1934-an de hatiye derxistin, ya herî bi nav û deng e. Vê qanûnê ne bi tenê mala bi sed hezaran Kurd wêran kir. Lê wê peywendiyên çînî, pêşdeçûna kapitalîzmê, dînamîkên civata Kurdî û hwd. ji binî de texrîb kirin. Beşikçi bi vê lêkolîna xwe ve pirseke giring tîne meydana gotûbêjê ya pirsên Kurdistanê û Tirkîyê.

Name ji bo UNESCO-yê
 Weşanxana Dengê KOMAL,
 1983, 62 rûpel, Stockholm

UNESCO-yê di roja 27.11.1978-an de, da ku sedsaliya ji dayîkbûna Mistefa Kemal di sala 1981-an de pîroz bike, bîryarek wergirt. Beşikçi, bi vê hülkeftinê nameyekî ji UNESCO-yê re dişişne û têde rexneyên giran û di cîh de lê digire.

Li rojhelat Guhirîn û pirsgirêkên pêkhatinî
(Eşîreta Elikan ya Koçer)
 Weşanxana Dogan, 1969, 255 rûpel, Enqere

Ev têza Beşikçi ya doktoraya sosyolojiyê ye. Wî di vê têza xwe de li koçerên Elikan hûr nihêriye, pêkhatina eşîrtî û koçeriya wan vekoloye. Di vê vekolînê de guherînên ku mercên civakî û aborî existîne nav civata Elikan û pirsgirêkên ku wan guherînan bi xwe re anîne, dihêtin berpêş kirin.



Metoda Zanistê
Bikaranîna wî li Tirkîyê: III
Destûra Partiya Xelqê Cumhuriyetê (1927) û pirsê Kurdî
 Weşanxana KOMAL, Gulan
 1978, 316 rûpel, Stenbol

Ev lêkolîna Beşikçi ya li ser destûra Partiya Xelq ya di zemanê yekpartîtiyê de ye. Beşikçi di wê de nîşan dide, ku ev destûr gelekî di ser Qanûna Bingehîn ya 1924-an e. Li gor vê destûrê, serekê partiyê ku nedihat guhartin, ku ev jî "Şefê mezin" Mistefa Kemal û bi dû wî re jî "Şefê Millî" İsmet İnönü bû, dikarîbû bi riya tayînê endamên parlamenta Tirkîyê tesbît bike. . . Lê ev belge demake dûr û dirêj ji "Zanyarên" Tirkan re nebûye meraqa lêkolînê. .

**Metoda zanistê**

Bikaranîna wê li Tirkîyê: II
"Têza Dîrokê ya Tirkan" û pirsê Kurdî
 Weşanxana KOMAL, Hizêran
 1977, 261 rûpel, Stenbol

Ev afirandinê lêkolîna Beşikçi ya li dîrokê nihêrîna îdeolojiya resmî ye. Ew bi belge û dokument, bi dûr û dirêjahî kad dike, ku çilo Mistefa Kemal û hestîkojên li dora wî civiyayî, rastiyê diguhirînin. Gişt bajarvaniyên Tirkan û Sumer, Hitît, Xudayên Misrê, Ege, Roma, Hind û Çînê Tirk nîşan didin. Bi riya "Teoriya Roj-Ziman" ne bi tenê Kurdan lê belê heta sorçermên Amerikayê jî dixwazîna Tirk nîşan bidin. Li gor Beşikçi Mistefa Kemal û hestîkojên wî bi xwe jî dizanîbûn ku ew bi vir û derewan ve mijûl dibin. Lê da ku îdeolojiya resmî têkeve kar, diviya "rastiyên zanistî yên misoger" ji wan vir û derewan re bihatana dîtin. Ev hem ji bo pê bawerkirinê û hem jî danbawerkirinê pêwîst bû.

Liberxwedan

Weşanxana Dengê KOMAL,
 1984, 240 rûpel, Stockholm

Ev pirtûk ji metnên îfadeyên Beşikçi yê li ba polîs û dadgirê leşkerî, ji îdîanname û metna liberxwedana wî ya ji ber nameya ji sereka Yekitiya Nivîsevanên Swîsrî Sîf BONLANGER-ê re nivîsandî, pêk dihê.

Dûmahîka rûpel 9

polîtîk, sosyo-aborî analiz dike. "Mêtod a zanyarî" bi serê xwe ne tiştê e. Karektera wê ya sinifî, îdeolojîk û teorîk heye. Beşikçi, vê metodê, di navbera bîr û bawerîya bûrjûwazî û sosyalîzmê de bi kar tîne.

Tê gotin: "Her egît bi babetekî mast dixwe". Ev gotin ji bo Beşikçi jî derbas dibe. Beşikçi jî di xebat û têkoşîna xwe de uslûbeke taybetî bi kar tîne. Ew uslûba jî li her derê, di parastina gelê Kurd û doza Kurdistanê de xwe dide xuya kirin. Ew uslûba wî, heta tixubê sekteriyê jî diçe. Ji ber vê uslûbê jî berî 12-ê îlonê ji Tirkiyê derneket. Hat zîndan kirin. Di zîndan û dadgehê de bîr û baweriyên xwe, bi vê uslûbê parastin. Helbet di parastina bîr û baweriyê de, mêranî û fidekarî, tiştêkî gelek baş e. Çimkî, ji bo şaxsiyeta mirov, li paş bîr û baweriyên xwe sekinîn, şexsiyetê dia-

zanîn, pîrsa Kurdistanê ne bes pîrsa gelê Kurd e. Pîrsa neteweya serdest e jî. Yanî, pîrsa gelê Tirk, Erebb û Fars e. Pîrsa, hereketa şoreşger-dimokrtayên Tirk, Fars û Erebban e. Tengiya li Beşikçi heye, dibe sebeb ku ew, di van pîrsan de bîr û baweriyên fireh biafirîne. Beşikçi, di vê niqte de hesas hereket nake. Ji aliyê din ve, qiyemte nadê pîrsa milliyetên din yê ku li Kurdistanê hene. Ji bo vê jî, lêkolînê nake. Birayê min yê mezin Beşikçi jî dizane ku ev bi ilmî jî kêmasiyeke mezin e. Ew ê zerarê bide doza Kurdistanê û gelê Kurd.

Helbet di bikaranîna uslûban de, gerek mirov makyavelîst, durû û fêlbaz nebe. Uslûbê însanî, demokratîk û meşrû bi kar bîne.

Uslûb, helbet girêdayî bîr û bawerîya mirov e. Bîr û bawerîya mirov jî, tiştêkî giştî ye. Ew di hemû hereketên mirov de xuya dike. Beşikçi, çawan ku di uslûba xebat û têkoşînê teng difikire, di pîrsên esasî de jî teng difikire. Dawiya vê teng fikirîne, li der û dora xwe dîwar çêdike. Wek tê

zanîn, pîrsa Kurdistanê ne bes pîrsa gelê Kurd e. Pîrsa neteweya serdest e jî. Yanî, pîrsa gelê Tirk, Erebb û Fars e. Pîrsa, hereketa şoreşger-dimokrtayên Tirk, Fars û Erebban e. Tengiya li Beşikçi heye, dibe sebeb ku ew, di van pîrsan de bîr û baweriyên fireh biafirîne. Beşikçi, di vê niqte de hesas hereket nake. Ji aliyê din ve, qiyemte nadê pîrsa milliyetên din yê ku li Kurdistanê hene. Ji bo vê jî, lêkolînê nake. Birayê min yê mezin Beşikçi jî dizane ku ev bi ilmî jî kêmasiyeke mezin e. Ew ê zerarê bide doza Kurdistanê û gelê Kurd.

Ez, ji bo Kek Beşikçi û xwişka delal û fidekar Lêmanê re, serkeftin û serfiraziyê dixwazim. Pêşketina xebat û têkoşîna wan daxwaz dikim.

Ji aliyê metoda zanistî, otombûna zanistgehê û civata demokrtîk de DOZA ÎSMAÎL BEŞİKÇÎ, I

Ev pirtûk 543 rûpel e û di Nîsana 1975-an de ji aliyê weşanxana KOMAL de li Enqerê hatiye çap kirin.

Ev pirtûk ji afirandînekî bêtir di rengê dosyayêke dokumenter e. Tê de ji gilî û îxbarnameyên hevpeşeyên Beşikçi, yê bi tîtlên Dekan Prof., Dr. Rektor, Prof. Dr., Doç. Dr., Dr. û hwd, hene. Herweha metnên bersîvên Beşikçi û yê liberxwedanên wî yê di demûdezhê û dadgehên gerandina awarte de hene. Belgeyên di vê dosyayê de xweş nişan didin, ku zanyar (!) û hesîkrojên rejîmê, berdevk û berdevdêrên îdeolojiya resmî û serdest, çilo bi awakî sistematîk xebitîne da serê Beşikçi bixwin. Da ku zanyarên bi rûmet di demûdezhê zanistî de nehêwirin û pêşerojê rastiya çîrokên ji 50-60 salan bi vir de gel pê dixapînin, dernekevin ber rona-hiyê.



Wir wollen frei und Kurden sein

(Em dixwazin azad bijîn û Kurd bimînin)

Weşanxana ISP, Sibat 1987, 124 rûpel, Frankfurt am Main

Ev pirtûk wergera almanî ya nameya Beşikçi ya ji bo UNESCO-yê ye. Çapa didwan e û lê hatiye zêde kirin.



«نايدۆلۆجيه تى كه مالى له توركيادا له سر درۆ بئنده ...»
 و بهم جۆره وهكوه دهنگيكي ياسا و زانست و مرۆفاه تى و
 ديموكراتيه تى و شارستانيه تى هاوچهرخ، وهكوه مرۆفاه تى
 خاوهن ههلوئيست له ژيان و رووداوه كاي؛ زۆردارى توركييا
 دژ به كوردستان به تاوا تىكي گهره تى هم چهرخه ده زانست، و
 پر به دهنگ بانگى نازادى و سه به خۆيى نهكات بۆ نيشتمانى
 داگيركراوى كورد، و به تهنيا ره خه له هه موو نايدۆلۆجيه تى
 ره سمى حكومه تى توركيياى كۆنه پهرست نه گريت، و راگه ياندى
 و ياسا و دانيشگا و پهروه رده تى شوؤن نيشتمانى تورك به درۆ
 نه خاته وه، و به گشتى ره خه له نه توه يه كگرتوه كان نه گريت،
 و ههروه ها له راگه ياندى و راي گشتى رۆژه لائى ناوه پراست



و جيهان، و به ناشكرا هاوار نهكات و نه ئيت كه بارى
 چهوسانده تى كورد و كوردستان زۆر له بارى ره شه كانى
 نه فريقاى خوارو سهخت تر و دژوار تره و نه بئيت مافى چاره
 نووسى گه لى كوردستانيش وهكوه هه موو گه لانى ترى جيهان
 مسۆگه ر بگريت، و نه توه يه كگرتوه كانى له سر بئيت دهنگ!
 باشكچى نمونه تى كى چاكي رۆشن بيرانى تورك و عه ربه و
 فارسه، و زۆر به ويژدان بئير له كيشه تى كوردستان نهكات وه و
 چاك له راستيه گه يشتوه كه ده ئيت:

«و گه لى كه گه ئيكي تر ده چهوسين ئيت وه خۆي نازاد نيه!»

باشکچی چاک نایدۆلۆجیه تی ره گه زپهرستانه ی تورکیای دیراسه کردووه، و بۆی ده رکه وتوووه که ئه و نایدۆلۆجیه ته زۆر شتیکی کۆنه پهرست و دژواره بۆ ئه م چهرخه، و به تایبه تی که راستی و زانست ره ت نه کاته وه، و به درۆ و ده له سه ی زۆر ساویلکانه، که هه موو مرۆفنیکی هه وشیار گالیه یان پێ ده کات:

ئه م نایدۆلۆجیه ته په رپه وته به یی شه رم ده لیت:

که کوردی زمان نیه و کورد میلله ت نیه - کورد تورکی شاخاوین - و هه ر له به رته وه نه ک هه ر ده وه له مه ندی کوردستان، به لکو کولتوری کوردیش به یی تورک نه زانن، و نه ویش نه دزن و نه یکن به یی خۆیان - ئه م سروشته شیان بۆ ته خوویه کی خراپ و چاره ی تورکیای له جیهاندا گران و ناشیرین کردووه، چونکه نه یانه ویت به م جۆره نکولی له بوونی کورد و کوردستان بکن، و له کاتیکیدا نه وه راستیه که و نه بینریت و نه بیستریت و به هه موو جۆرێک.

مامۆستا باشکچی وه کوو زانایه کی دلسۆز بۆ مرۆفایه تی و دۆستایه تی تیوگلان ئه م بۆچوون و زۆرداریه یی تورک شوۆفینییه کان تاوانبار نه کات، و ته واری فه لسه فه کیان، هه ر له نه تاتورکه وه هه تا که نان نیغرتین به درۆ نه خاته وه، و به هۆی سه ره کی و کۆنه پهرستی و دواکه وتنی تورکیای دانه تیت، و هه ر بۆیه کا له جینگیه کی تری هه مان نامه ی دا بۆ یۆنسکۆی سه ر به نه ته وه یه کگرته وه کان به م جۆره نه دویت:


«دووڕوویی یه کتیکه له روخساره کانی بناغهی نایدۆلۆجیه تی ره سمی له تورکیادا، و هه مان رێبازی بیه کردنه وه له لایه ن دانیشگا کانی شه وه په یه وه نه کرتیت، نه مه ش له کاتیکیدا که دانیشگا ده بییت به ر له هه موو شتیکی په ره به زانست بدات .. رێبازی دووڕوویی له بیه کردنه وه دا، و هه روه کوو په یه وه وێک دژ وپێچه وانه ی زانسته، بیه ری دانیشگای تورکی وراگه یاندنی تورکی، ده زگا کانی یاسا و پارتیه رامیاری و نه نجومه ن و جفا ته کان نکولی له بوونی کورد نه کن، و ئه م ریکخراو و ده زگایانه ده لیتن که گوايه - هه ر که سێک له تورکیادا بۆی تورک - به لām له راستی دا ئه مه زانستی نیه، چونکه زانست باه ته یی و له راستی روودا وه وه به ده ر ده که دویت، و زانست و مرۆفی زانست بۆیان نیه که نکولی له بوونی نه ته وه ی کورد بکن و ره تی بکه نه وه» باشکچی به نا شکر له هه مان نامه ی دا ده لیت:



ئىسمائىلى باشكچى:

كوردستان موسته عمه ره به كى نيوده وله تيه!

ئىسمائىلى باشكچى نووسه رېكى كۆمهلايه تى به له توركييا، و مرۆڤىك بېروباوه ر ديموكرات و هاوچه رڤه، مامۆستاي سۆسيۆلۆجيه له دانىشگا و زۆر لىكۆلئنه وه و نووسىنى بلاوكراره ي هه به له سه ر كورد و كوردستان، و هه ر له سه ر نه و نووسىنا نه ي له لايه ن رژىمى شۆڤىنى و ره گه زه پهرستى توركييا وه به درى ژايى سالانى ۱۹۷۱ - ۱۹۸۷ خراوه ته زىندان - چونكه له توركيادا و به پى ئى نايدۆلۆجيه تى ره سمى و هه ر له درووست بوونى كۆمارى توركييا وه، و به پى ئى ياساى كه مالىه ره گه زه پهرست و شۆڤىنيه كان ناوه ئىنانى كورد و كوردستان ياساغه، و هه ر كه سىك له سه ريان بدوئيت، يان بنووسىت به پى ئى به سزاي توند و تىژى نه درىت.. مامۆستا باشكچى به كىكه له كه سانه ي كه پشت به لىكۆلئنه وه ي زانستى ناوه رۆكى شۆڤىنى و كۆنه پهر - ستانه ي نايدۆلۆجيه تى ره سمى له توركيادا پوچ كردۆته وه، به تايبه تى كه نه و نايدۆلۆجيه ته دژى بوونى كورد و كوردستان و نكولئىيان لى ده كات، و له كاتىكدا كه توركييا نيوه ي راستى خاكى كوردستانى داگير كردوه و هه ر له سالى ۱۹۲۲ به دواوه! باشكچى به پىچه وانى هه موو مامۆستاكانى ترى دانىشگايى توركييا وه نه كات و له جياتى بى ده نگ بوون له كيشه ي كورد پهر به ده نكى زرنكى زانايى و مرۆڤايه تى هاوارى نازادى و سه ربه خۆيى بۆ كورد و كوردستان نه كات، و به پى ترس له سزاي جه نراله گيله كانى توركييا - باشكچى له نامه به كى دا كه له سالى ۱۹۸۱ دا بۆ ده زگايى يۆنسكۆي سه ر به نه توه به كگرتوه كانى نووسيوه به ناشكرا ده لىت: «كوردستان موسته عمه ره به كى - كۆلۆنى - تيوده وله تيه له ناوه ندى رۆژه لآتى ناوه راست دا دابش و داگير كراوه، و هه موو ماقىكى نه تراهه تى و رووخسارى ده روونى و ماددى خراوه ته ژىر زه بر و تالآتىكى دژواره وه . نه توه ي كورد به تله بندى دپكاوى، و ميني بۆمباي ژىر زه مين و بورجى چاودىرى و سه ربازگا، و به هه موو جوړىك لىك دابراوه، هه موو شتىك له كوردستان دا، ته نانه ت بچوك ترىن شت جىگايى سه رنجى داگير كراوه - نه و ولآتانه ي كه كوردستانيان داگير كردوه نه يانه وئيت به هه موو شيوه به ك كورد به ژىرده ستى خۆيان بىنىته وه، و له به رنه وه هاوكارىش نه كه ن له ناوخۆيان دا» .



خوینتاری بهریز:

پاراستنی مافی گهلی کورد • بی مهترسی و گوی نهدان له زانکو دهرکردن و نازار و بهند کردن و ۱۷ سال زیندان • دوکتور بهشکچی نازایانه پهردی له سیاستی کولونیا- لیستی و دژ مروقی ریژی می تورکیا هلمالیوه، به پیچه- وانهی (روناکبیر و دیمکراتی) - تر • هیچ کاتیگ له هلوپستی و بوو چونی خوی پهمیمان نهبوو، بهلک- لهو کاتهی که سایهتی تووشی دژوارترین بار هاتوو، دهنگی بهرز تر کردوه بو دهربرینی راستی و بهرگری له مافی گهلی کورد و ریسا کردنی کولونیا لیست و شوقونیزم • نازایهتی و جهسوری و میرخاسی دوکتور بهشکچی- نهوونهمیگی بی هاتای ئینسانیکی دیموکرات و مروقی پهروهه بو ههوو کوردیکی تیگوشهر له پیناو ژیانیکی نازاد و سهر بهست دا •

خهبات و هلوپستی جوامیرانهی بهشکچی و پاراستنی پیرینسیبی زانستی و مروقایهتی جی شانازی ئیمهیی- کورد •

کهییا ئیزول

دوا به دوی دهرچوونی دوکتور ئیسماعیل بهشکچی- له زیندان، دهستهی نووسهرانی " بهربانگ " بریاری دا ژماره یهکی تایبهتی ترخان بکا بو ژیان و تیگوشانی دوکتور بهشکچی •

بو ئهم مه بهستهش دهستهی نووسهران پیوهندی بهست بو مروقانهی که له نیزیکهوه دوکتور بهشکچی یان دهناسی و تیگه لاویان له گهلدا ههبووه له زیندان، بهتایبهتی ئهو ههقالانهی ۱۷ ئاداری ۱۹۷۱ گهرايوون و لهزیندانی دیار بهکر بهند گهرايوون و ئاگاداریان له ژیان و هلوپستی دوکتور بهشکچی- عین • ههندیگ لهو ههقالانه به پیلیمان هاتن، ئیمهش سیاسیان دهکمین •

ئهم ژماره تایبهتی دوو مه بهستی سهرهکی ههیه :

- بایه خدان و ههلسهنگاندنی خهبات و تیگوشانی بهشکچی - ناساندنی خوینهرانی کورد بو تیگوشهره کولنه دهره •

لهو سالانهی دوا یی ههر چهنده زور له سهر بهشکچی- نووسراوه، به لام زوری بهی به زمانی بیگانه بووه •

دوکتور بهشکچی، مروقیکی زاناو روناکبیرو خاوهن بیرو هلوپستی مروقانهیه، به ههوو توانایهوه تیگوشاوه بو

بهربانگ

ئۆرگانی فیدراسیۆنی کۆمهڵه کوردستانیه کانه له سوید

ئابوونی سالانه ۱۰۰ کرون سویدی بۆ دهرزگاکان ۲۰۰ کرون سویدی

بهرپرسيار: ک. ئیژول سهر نووسهر: ر. زیلان
دهستهی نووسهران: م. بهکر، ج. کزین، ر. سمل، ج. حهیدهری

Berbang

ناوئیشان:

Box. 45205, 104 30 Stockholm

643880-8

پۆستگیری:

08-68 60 60

تلهفون:

دهستهی نووسهران بهرپرسيار نيه له نووسين و وتارمهکانی فیدراسیۆن.
ئو نووسینانهی بۆ بهربانگ دی، گهر باو نه کریتسه بۆ خاوهنهکی
ئاگه پیتوه.

”Îdeolojiya resmî ya li Tirkiyê bi îsrar û rikdarî hebûna neteweke bi navê kurd û zimanekî bi navê kurdî înkâr dike. Ev îdeolojiya han ya ku em bi kurtebirî jê re dikarin kemalîzm bibêjin, bi awakî misoger li dijî kurd e, nijadperest û kolonyalîst e. Ev îdeolojî bi zanistgehên tirkan, bi organên dadmendî yên tirkan, bi partiyên siyasî, bi navgînên ragihandinî yên wek çapemenî, radyo û televîzyona tirkan jî dane qebûl kirin. Di vê maweyê de her cure navgînên zordestiya îdeolojîk û navgînên zorlêdanê bi kar anîne û bi kar tînin. . . .”

Dr. İsmail Beşikçi